

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELĒN KURDISTĀNĒ LI SWEDĒ



## BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris Layout och sättning : Cotkar och Gundi.

## ADRESS

Kurdiska Riksförbundet Rissneled ed 55, NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.  
/ år övriga 100 kr/ år  
Postgiro: 643880-8

## BERPIRSİYAR :

A. TİGRİS

## REDAKSİYON:

BAVĒ NAZĒ

S. QERECDAX

C. SERO

MUĒYED TEYIB

BRİNDAR

ADIL DURAN

## PERGALA RÖPELAN:

COTKAR O GUNDİ

## BERBANG

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona Komelén Kurdistanê li Swêdê Biha: 5 kronë swêdê  
Abone: sal 50 kron

## NAVNİŞAN

Berbang, Rissneleden 55 NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden  
Postgiro: 64 38 80-8

## NAVEROK

"KÊ KEVOKA AŞTİYÊ KUŞT," ..... 3

Kardo Metînî

KÎ - ÇIMA PALME KUŞT? ..... 4

A. Tigris

NEWROZA WE PİROZ BE! ..... 5

Şiyar

MERÊ BERÊ

..... 6-19

J. Rexnegir

ÊŞKENCEYÊN KU MIN DÎT ..... 7-8-9-10

Z. Abidin

SALNAMA KURDİ ..... 11

Bareş Batê

Jİ FEDERASYONÊ Ú KOMELAN NÜÇE ..... 12-13

..... 14-15-16

S. Qerecdax

BIZAWA ŞEX SEİD ..... 17-21

..... 17-21

TOLERANS - BAWERÎ Ú RONAHÎ ..... 20

C. Sero

WINDAYO ..... 18

Bavê Nazê

BÜKA AGIR ..... 20

Ahmed Civanro

XEBATA KURDZAN LAMARA BARIYE ULMÎ ..... 22

Temûrê Xelîl

Sistema Federasyonên biyani di 1987-an de  
TÊ GUHARTIN ..... 22

..... 22

NEWROZ ..... 23

Civanê Gulan

## daxuyanî

FEDERASYON, DÊ KONGRA XWE DI VÎ CÎ Ú MÊJÛYÊ  
DE PÊKBÎNE:

Cî: Kungsholms Gymnasium, Hantverkargatan 67-Fridhemsplan

WEXT : 5 û 6 ê Nisanê 1986 — Saet: 10.00 — 18.00



# "KÊ KEVOKA AŞTİYÊ KUŞT,, kardo metînî

Wekî hemî êvariyên rojêñ eyne — ku dawiya heftiya kariye li vî welatî — xelkê Swêdê ji malêñ xwe derdiketin, hin ber bi bara û cihêñ dilanê diçûn, hin diçûne seredana dost û hevala û hin diçûne sînemayê.

Olof Palme serokwezîrê vî welatî ji digel jina xwe ji mal derketin. Wekî her miroveki normalê xelkê bajêrê Stockholmê, Palme û jina xwe ji li metroye siwarbûn û çûne sînemayê. Li sînemayê dîsa wekî her miroveki normalê vî bajêri, Palme li rêzê rawestiya û bilêt birî. Pişti film bi dawî hatî Palme û jina xwe ji ji sînemayê derketin. Şev bû. Seêt ji yazde derbas dibû û bayekî gelek sar dihat. Ne wek hemî serokwezîren cihanê deh marsidîs li benda wî bû,

ne ji wek gelek diktatorê cihanâ sêyem sêsed yan çarsed esker li pey bûn, ne xêr ew û jîna xwe û kesê din re. Bi piyan li cadeyeka hera serekî li bajêrê Stockholmê rîya mal girti bûn, wê şeva sar. Li devê kolaneke teng û tarî dengê guleyekî hat, jîna wî li ser milê xwe zivirî, dît... vaye Palme serokwezîrê Swêdê li axê ye û kaniyeka xwînê di singa wî de derbûye! Spêdêya ye-kî Adarê xelkê swêdê ji xew rabûn, berî têsta spêdê — wekî edet li wî welatî — rojame vekirin, dîtî termê serokwezîre xoştîvî Olof Palmê ser û binêñ rojnamê girtine! Ji çavêñ xwe bawer nekirin, lê hêdi-hêdi zanîn ku eve rastîye û şivedî 28 ê Şîbatê Palme li ser cadeyekê li nîva bajêrê Stockholmê hate kuş-

tin bi destê miroveki nenas!

Spêdêya yekî Adarê, ez ji mal derketim, xemeka giran dilê min girtî bû, min dît di bin barê vê xema giran da pişta vî welatî ya xar bûy. Ji çavêñ her kesê xem dîbarin, ji dengê her kesê xem dîbarin. Bê dengiyeka xemgîn ev wela-te dagr kiribû û bê dengî xelk diçûne tewafa cihê kuştina Palmê. Rîya min di wêrê ket, ez geshiştîme wêrê bi sedan swêdî û bîyanî wê spêdê ji xew rabibûn û ji her cihekî vî bajêrê mezin li dor xwîna Palmê kom bibûn. Bi bê-dengî serêñ xwe di ber xwe dana bûn û bi du çavêñ tijî rondik li xwînê dinêrin û koşlîkîn sor li ser xwîna sora Palmê dîbarin. Çend seêtek ne borîn gire-ke mezin ji koşlîkîn sor xwîna Palmê nixaftû çend rojek ne borîn ew gir bû, çiya û devê kolane girt. Li ser stûneca kahrebê min kaxizek dît, êkî bi destî kevokek nexsand dibû, xwîn ji singa kovêkê di werya û li jîr bi xetê zarokekî nîvêsi bû " KÊ KEVOKA AŞTİ-YÊ KUŞT!! "

Palme, di temenê pêncî û neh saliyê da şehît ket. Bi dirêjiya temenê xo yê siyasi xebat dikir. Ji gelê xwe re, ji bûr û bawerên xwe re, ji gelêñ bindest re û ji doza aştiya cihanê re. Palme, dos-teki gelek mezinê gelêñ cihanâ sêyem bû, demê împaryâizma Emerikî hêriş dîbirne ser gelê qehremanê Vietnamê Palme, li pêşıya dêmostrasyona (meşa) bû li bajêrê Stockholmê û bi hemî dengê xwe hawar dikir " Emrika derke-ve ji Vietnamê!"

Palme, di hemî helwestêñ xwe da piş-giriya gelêñ cihanâ sêyem û doza aştiya cihanê dikir û eve bû bûye hoye hindê ku ne tenê li welatê xwe yê xoştîvî bû belko li hemî cihanê û her eve bû bûye hoye hindê ku ne tenê swêdiya ki-re şîmî û nîhar belko li gelek welatên din şîn wî mezintîr bû û dîsa her eve bû bûye hoye hindê ku dijminê aştiyê jê ditîrsan û kuştin.

Dema Palme şehît ketî gelê swêdê û aştikwazîn hemî cihanê pê re pîrsîyar dikir: " KÊ KEVOKA AŞTİYÊ KUŞT! " û dîsa gelê swêdê û tev aştikwazîn cihanê pê re bersiv dida "kî de kevoka aştiyê kojît ne dijminê aştiyê bît."

Li roja 15 ê Adarê demê axê termê Palme hibêz dikir dîsa xelkê swêdê koşlîkîn sor dîbirne ser gorê wî û weha di-gotin: Spas bo xebata te, Palme, tu dê di dilê me da ji.

Em kurd ji, bi gelê swêdê û tev aşti-kwazî azadîkwazîn cihanê re dibêjin... Palme tu namirî, hîvî û armancêñ te dê di dilê gelêñ cihanê da jîn û çiqas dijmî-nê aştiyê pekolê biken kevokêñ spi-dê tim û tim li asmanê şîn firin!..



## kî, çîma olof palme kuşt?

A. TİGRİS

Kevnerok wezîrê Swêdê Olof Palme, di roja 1 ê Aadarê de li bajare Stockholmê ji aliyê keseft nependîve hat kuştin. Hezar mixabin heta û tro jî mîrkujê Olof Palme nehat dîtin. Li ser bûyera kuştina Palme, di nav awiragelempériya demoqratîk a Swêdê û cîhanê de pîrsêke gelempîrî heye:

"Kî, çîma Olof Palme kuşt?"

Li vê derê du pîrsên bi hev ve girêdayî hene; "KI" û "ÇIMA."

Polis û sazgehêñ fermî yêñ Swêdê bi xebatekê tek-nîkt, pir altî û bêvestan heta

tro bi awakî fermî û berçav nikarin "KI" yê tespit bikin. Ev jî dide dîyarkirin ku "KI" yê nependî xwedîyê hêzêke mezin û profesyonel e.

Bersiva didûyan a "ÇIMA" ji aliyê herkesî ve dîyar û zelal e. Ji vê bersivê re şirovekirin ne gengaz e. Ser-êşandin, dûr û dirêj likolîn-lêgerîn jî ne pêwîst e. Ji lew re di arena sîyaseta Swêdê û cîhanê de rolekê Olof Palme yê giring û mezin hebû. Palme, di nav sosyaldemoqratîn Eurupa û cîhanê de xwedîyê politîka-yeke cûda bû. Ew li dij blo-

kên leşkerî bû. Li dij çek daryê bû. Wî di Swêd, Eurupa û tevaya cihane de aştîyê diparast. Wî, di şerê li dij kolonîyalizmê û dagerkirinê de cî û tewrê xwe bas zelal û dîyar dikir. Şerê Vietnamê, Nîkaraguayê û yê Afrîka Başûr di vî warti de mînakîn herî mezîn û berçav in.

Mîrkuj, destpişt û pas-mîrên ku Olof Palme kuştin û dan kuştin dijminên demoqrasiyê, aşitîyê û miro-wattîyê bûn û dê herweha jî bimînin.

Bi milyonan kes Olof Palme bi bîranin û dê bînin jî!



# NEWROZA WE PİROZ BE!

## GELİ XWENDEVANAN!

FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANÊ LI SWËDÊ, DI ROJA 22.03 1986 – AN DE LI BAJARÊ STOCKHOLMÊ, DI SALONA ASO GYMNASIUM DE BI ŞAYİYEKE MEZIN NEWROZÊ PİROZ KIR. DI BERNAMA ŞEVA NEWROZÊ DE ZOZAN, RENAS, KIKI, BRÎNDAR Ü NASIR REZAZÎ WEK SOLO CI GIRTIN. GRUBA FOLKLORE YA KOMELA JİNEN DEMOKRATÊN KURDISTANÊ Ü YA KOMA ŞENGAL, ŞEVA NEWROZÊ XWEŞ Ü GEŞ KIRIN. JI 500 KESİ BËTIR KURD, SWËDÎ Ü BÝYANIYÊN DIN DI ŞEVÊ DE BEŞDAR BÜN. BI STRAN Ü DİLOKAN GOVEND QOR BI QOR DI SALONÊ DE MEŞİYA Ü GEŞ BÜ.

S. CİZİRİ, BI KURDİ Ü SWËDÎ BERNAMA ŞEVÊ MEŞAND Ü ŞEVÊ İDARE KIR. SEROKÊ FEDERASYONÊ HEVAL ŞİYAR, AXAFTINA NEWROZÊ PEŞBERÊ BEŞDARAN KIR KEÇIKA SWËDÎ MARGRETA AXAFTINA SEROKÊ FEDERASYONÊ BI SWËDÎ XWEND. EM, GOTARA ŞEVÊ YA KU SEROKÊ FEDERASYONÊ, PEŞKESİ BEŞDAREN ŞEVÊ KIRI BÜ, JI WE XWENDEVANÊN XWE RE Jİ PEŞKESİ DİKIN.

Mêvanên hêja, hevalên birêz! Em, îro Newrozekê din pîroz dîkin. Newroz wek simbola tekoşina serbixwebûn û azadiya gelê kurd tê pîroz kirin. 21 ê Adarê nişana ronahî, xweşî û gerdenazîyê ye. Di dema 21 ê Adarê de zivistan, ba û bahoz, tarî û nexweşî li paş dimînin. Di şûna nexweşî û tarîtiyê de, ronahî û xweşî cî digre. Jîyan ji nû ve geş û jîndar di-be. Lê ji aliye gelê kurd ve, Newroz xwediye mane û naverokeke taybetî ye. Gelê kurd Newrozê, wek cejna biharê an ji, bi awakî din pîroz nake. Newroz herweha nişana li berxwedana gelê kurd,

li diji koledarı, stembarî û li diji zilm û zorê ye. Bi kurtî Newroz, ji bo gelê kurd hem di warê tebiêtê û hem ji, di warê netewî û civakî de cîhekî giranbiha digire.

Hevalno!

Di van rojêñ ku em Newrozê pîroz dîkin, welatê me Kurdistan hin ji bindest û gerdenxwar e. Zincirên koledarîyê hin ji nehatine parce kirin; xwîn û elemma brîna gelê kurd hin ne sekiniye. Lê ev rewş wilo namîne, çerxa dinê her bi pêş ve diçe. Bi vê pêşveçûnê, tekoşina rizgariya gelê kurd ji, para xwe digre.

îro li her çar parçen Kurdistanê, tekoşina gelê kurd, ji bo serbi-xwebûn û azadiyê berdewam e. Li derveyî welat karker û xwendevanen kurd barek ji bareñ xebata rizgariyê dane ser milê xwe û erka xwe ya welatparêziyê bi cih tînin. Li du parçen Kurdistanê, gelê kurd rabûye ser piyan, pêşmîrgeyê qehreman bêtirs xwîna xwe di ber welatê xwe de dirijînin û roj bi roj mewzî û merhelêñ mezin bi dest dixin. Li Kurdistan Bakûr ji xebata netewî û civakî, her çiqas ne wek berî be ji, lê cardîn gelê kurd dev ji doza xwe bernedaye û vê doza bi rûmet dimeşîne.

Hevalno!

Bi kurtî Newroz nişana rêberî û liberxwedanê ye; nişana tekoşina rizgariya netewî û civakî ye. Newroz, nişana aşî, gerdenazadî û nişana mirovatiyê ye!

Rojek bê dê gelê kurd ji, wek KAWEYÊ qehreman serê Deheqan, serê neyar û koledaran bişkîne û di welitek serbixwe û azad de bi gerdenazadî biji!

BIJİ NEWROZ!

BIJİ KURDISTANEK SERBIXWE Ü AZAD!

NEWROZA WE HEMÛYAN PİROZ BE!

ŞİYAR

## ÇEND MESAJ

Partî, rexistin û komelêñ ku ji şeva Newrozê re mesaj şandi bûn, em navêvan li jîr dinivîsin:

Yekîti Nîşîmanî Kurdistan  
Eniya Demokratîk a Nîşîman li Îraqê  
PPKK-Komîta Swêdê  
TKP (B) Komîta Swêdê  
Komela Piştgiriyê (Dayanışma)  
KOÇ-KAK  
İSTIB

Komela Gehî Kurdistanê  
Navendîya Çanda Kurd  
Komela Kurd li Bolnâs  
Komela Çanda Kurd li Botkyrka  
Komela Jinen Demokratîn Kurdistanê

# mêrê berê

J. REXNEGIR

Bi vekirina derî re Apê Remo ket hundir. Civatê hemû hêzda xwe û rabû pîyan. Apê Remo, li civatê silav da. Bi hatin û slavdana wîre quncika rastê hat valakirin. Apê Remo, meşîya quncikê û di cî de rûnişt. Bi rûniştina wî re hemûyan bi devek: "Merheba Apê Remo! Tu bi xêr hatî, bi ser seran û bi ser çavan re!"

Apê Remo, bi careke de "cevat û rehmet" got û bersiva hemûyan da. Xortê malê nazbalgiyek anî û da pey pişta wî. Paşê hinek êzing anî û avête ser arê kuçikê.

Apê Remo, li quncikê palda xwe, civatkî rûnişt. Navrana şalvarê xwe rast kir. Xwest destê xwe bike berîka xwe qutî û hesteyê xwe derîne; lê ji çend aliyan ve gelek qutiyên titûnê hatin ser doşeka Apê Remo. Yeki bi dengekî bilind:

- Dev ji wê qutiyê berde! Ji qutiya min çêke Apê Remo! Titûna min a Betlisê ye. Na, na ew nîn e! Ew qutiya spiya mezin.. Ka binêr kişandina wê çawa ye.

Ew, wê qutiya ku berê girtibû bi lez şûn ve avêt ser doşekê. Li qutiya spiya mezin geriya û dît. Wê girt û hilanî. Berê qutiyê kir nav destê xwe yê çepê bi tiliyên destê xwe yê rastê ji çend caran li ser hev li kêleka qutiyê xist. Paşê bi her dû tiliyên xwe yên beranek çîrp û devê qutiyê vekir. Xwe xûz kir û wê da ronahiya agir û kûr lê mêzekir. Titûnê girtnavtilyen xwe û rakir. Titûn wek porêñ keçik-kên Betlisê bi carekî de bi hev re hilkişîya. Ü Apê Remo, çav bi titûnê xist, xwe ranegirt:

-Kuro, bi xwedê, bira ji ev titûn, titûna Bedlisê ye! Erê Rizgo, mîna tu iş mezin biki! Ka ez kişandina wê binêrim; ger wek rengê xwe be, divê tu çend kilo bidî min ji. Wele tu bizorê ketî nav lepêñ min heee!

- Na, bi xwedê Apo; hevalekî min ji Bedlisê hatibû û qasî çend qutiyân da min. Lo, looo! ez li ku, kişandina titûna Bedlisê li ku!....

Bi hiskayî vekirina derî re, peyva Rizgo di dev de ma. Derî vebû. Silêmanê Hesen ket hundir. Ezingên ku di kuçikê(tifikê) de bûn, hêj baş agir negirtibûn. Çege-çeq ji wan dahatin, dikir ku agir bigirta. Lembeke biçûçik li bin xani bi diwar ve dalkandibû.

Qasi mûmeki ji ronahî nedida. Ji ber ku kuçik ji baş pênediket, wetaq tarî bû. Bejna Silêmanê Hesen maşelâh ji du metran kêmter ne bû. Ü herwiha ji tije û qelew bû. Lê tarîti yê hîn ji wî direj û qelew şanda. Silêman, di pozê xwe de silav da. Lê dengê silava wî neçû herkesî. Ji xwe kesê ku bi wî nizanbaya û wî nas ne kira, nizanibû, ku qet silav da an na. Silêman hema li ber derî, li nav darê solan rûnişt. Cîyê vala ji li pes gelek bû, lê adeta wî bû; dema ew biçîwa konaxan şevgerîka wilo li nav darê solan vedizeliya. Çend kes kir-nekir ew ji cîyê xwe ranebû û pêşve neçû. Silêman herdu lingên xwe ji di cî de direj kir. Herdu lingên wî heta nîvê wetaqê pekiyan. Li ku ban dê bigêhiştiya dîwarê din. Serê Silêman hebû zimanê wî tunebû. Mirovekî bê deng û nefş biçûk bû. Piçek ji dilsaf û saxik bû. Di gund de gelekan pê henekên xwe dikir. Digotin ku "pirîya dirêj e, loma aqil tune."

Apê Remo, li qunçik qulbe-qulp û kufte-kufta wî bû, dumana titûna Bedlisê di dev û pozê xwe de berdida. Dîsa hulmek kişand. Û dûwa gewr berda û li Silêman mîze kir û hulmeke din ji li cî xarê xist û dev avêt Silêmanê Hesen:

-Gidî Silo kurê kerê, meriv ji te ditirse. Tu bi şev rastî ki bêyî, bi xwadê dê ew bibizde. Tu bûyî wek mîrê berê sebab! Lê binêrin lingên wî gêştinê dîwarê din! Kuro, dê kîjan keçik mala xwe û bavê xwe xirab bike û te bistîne. Binêrin... Bi rastî nê-zîkayî li mîrêñ berê dike.....

Pirqên bi civatê ket, hemû ke-nîyan... Rebenê Silêman gelek şermezár bû. Nigên xwe di qî de kişand binê xwe û serê xwe xist dûmahîk 19

êşkenceyên ku min dit



## Z. ABİDİN

Generalen faşist, ji 12 - e ûlonê 1980 yi vir ve, li Kurdistana Bakûr, li ser kesen şoresger, welatparêz û demokrat êşkence, kuştin û karûbaren dalqandomê bi şeweke hov û har didomîne.

Xweza heta iro li Tirkîyê û li Kurdistanê di derbarê êşkence û hovîtiya lêşker û polisên tirk de pir hindik nûçe hatine belavkirin û nîvîsandin. Ev tiştên ku hatine nîvîsandin û belavkirin, jî kirinêن cunta faşist hezaran yek ji nîn e. Ji xwe ew barbarî û hovîtiya ku tê kirin ne mumkun e, ku mirov kari be bîne ziman û binivíse.

Li Kurdistana Bakûr, ew kesen ku êşkencen dij û derveyê însanetiyê li wan hatine kirin, yek jî, ji wan ez bi xwe me! Ez ji aliye dewleta koloniyalist û leşker û polisên wê ve 8 caran hatim girtin. Ez her car di çerx û makînên êşkencan de derbas bûm.

Ez dixwazim bi kurfi qala girtina xwe û di dema girtinê de ew cûrên êşkencen ku li min hat kirin, ji hêz û kesen şoresger, welatparêz û mirovperwer re bikim.

Destpêka girtina min weha bû:

1 — Cara yekem, di meha qileyê paşin (meya yekemîn) 1981 û de yuzbaşiyê (serbazê) navça cendirmê E-

Wek di fotografê de ji tê ditin, ji ber êşkence û lêdanê porê Zeynel Abidin tev kurisi û weşîya ye. Dema ku ew hat Swêdê, doktorê swêdî gelek li ser lekolîn' pêk anîn. Pisporê swêdî li ser encama êşkencan matmayî man.

lihê (Batmanê) Cafer Teyyar Çağlayan min girt. Çendek paşê min berda.

2 — Cara duyemin, ez ji aliye sawciyê Elihê — navê wî Metin bû — di meha sibatêya 1981 û de hatim girtin. Sawcî bîryara tewâfîkirinê da. Ji bo kîmîbûna delilan hakin min serbest berda. Lî vê dosya min a ha, di 1981 û de birêkirin mehkema eskeriya bajare Diyarbekirê.

3 — Cara sisîyan, serokê polisê siyasi Özden Uluğ, dîsa li Elihê, di meha adarêya 1981 û de min girt. Demekê ez li hundir man û dîsa min berdan.

4 — Cara çaran, dîsa Özden Uluğ, di eyni mehê de min girt. Di demeke kurt de min dîsa êşkencê de derbaskirin û berdan.

5 — Di roja 11-ê Gulanê 1981 û de, bi ferma serokê tuğaya bajare Sertê, li Elihê polisê siyasi, li ser karên min, ez girtim. Û min girtin birin Sertê. Di yekê Heziranê 1981 û de min berdan.

6 — Di 29-ê ûlonâ 1981 û de dîsa bi ferma serok leşkerê bajare Sertê, li Elihê min û çend hevalîn min girtin. Me hemûyan girtin û birin êşkencexanê tuğaya bajare Sertê. Tam 75 roj em di êşkencexan de man. Di roja 29. 12. 1981 û de me birin mehkema

eskeriyê ya Diyarbekirê. Li Diyarbekirê mehkema eskeri di roja 06. 01. 1982 yan de me 7 kesan berda û hevalîn din, girtin birin avêtin zîndana Diyarbekirê.

7 — Evcar ez ji aliye serokê qolordûya heftan a bajare Diyarbekirê ve, di roja 27. 10. 1983 yan de, li Elihê hatim girtin. Min birin Diyarbekirê û avêtin hucre "Kurdoğlu." (Lawê kurd). Di roja 16i 12. 1983 yan de ji bo 1-fade min derxistin ba sawcî. Û di roja 20. 12. 1983 yan de ji, min derxistin mahkemê. Hakimê eskeri di roja 24. 12. 1983 yan de texliya min da û ez hatim berdan.

8 — Li Elihê polisê siyasi ji nû ve min girt. Ez, di meha Sibatê 1984 an de cardin hatim berdan.

Ez, ji destpêka 09. 02. 1983 yan heya 1 û Adara 1984 an, 23 car wek "kesê bi sîcê serbest" di mehkema eskeriya Diyarbekirê de besar bûm. Cunta faşist hemû dawayêñ min di dosya 1982/559 mîjû û numare de civandin ser hev. Mehkema eskeriya bajare Diyarbekirê, di roja 01. 03. 1984 an de li gor bendên qanûna Tirkîyê 168 û 495 an, 5 sal heps û 20 meh cezayê tenezariyê (surgunê) dan min.

Di êşkenceyanan de, ew êşkenceyên ku li min hatin kirin, ez çawa sax filitîm nizanim. Ü ez, hêj ji dijim! Ez bi xwe bi jiyana xwe bawer nakim û şas û matmayî diminim. Ez dê niha ew cûrên êşkencen ku li min hatin kirin; û derbarê metod û êşkenceyanan wan de bi kurtî agahdariyek bidim we xwendevanan.

## ÊŞKENCEN KU LI MIN HATIN KIRIN Û ALETÊN ÊŞKENCAN

### 1 — ÇAVGIRÊDAN

Çavê girtî bi şidî girêdidin. Ü pê êşkence dikin. Ü herweha 30-40 roj çavên girtî venakin. Yen kesen lider heta 90 rojan jî venakin. Di piştî hewqaş rojî de dema vedikin, girtî, korkorsişki dibil û nabînin. Niha gelek kes hene ku ji ber vê cûra êşkencen çavên wan korbûne û nabînin. Ez çend kes nasdikim ku çavên wan ji bitî wan jî, kêm dibinin hene, lê ez naxwazim navêwan li vê derê binivisim.

### 2 — BEXEWI

Koledarên Tirk, di êşkenceyanan de, li me xew qedexe dikirin. Bi şev û rojan ne dihiştin em piçek razin û çavên xwe şerm bikin. Carnan heftek û carnan ji qasî meheke ne dihiştin kesen siyasi razin. Ez di girtina xwe ya şesan de sê car her care 8 roj, li ser hev 24 roj bê xew mam. Saet ji 07.00 ê serê sibê heya 24.00 ê şevê, piştî ku li min êşkence dikirin; heya saet 07.00 ê siba din çavû desten min girêdidan û min li ser singa min dihiştin. Cara ku me qaşo didan razandin jî, li pey êşkencen, dest û çavgirêdayî me davêtin ser çumentoyê û çend deqiqe paşê bi xorfüman av li me dikirin. Laşê me tev reş û şîn dibû û diwerimi.

### 3 — LÊDANA BI DAR Û ÇO

Ji darênu tu û hinar, şivikên yek sale jëdikirin. Ü bi wan li dest, ling û laşen me dixistin. Bi lêxistinê re diwerimian.

### 4 — ÊŞKENCA BI COP

Polis û eskerên tirk, navê copê danîne "HEYDER." Bi piranî ji bo lêdana kesen siyasi cop bi kar tinin. Cop sembola faşizmî ye. Copê ji para ve dixin şuna destavê. Eskerên faşist ji vê karî zewq digrin

### 5 — GIRÊDANA BI KINDIR

Kindirê ku min di êşkenceyanê de

dît ji benê naylon hatibû çêkirin. Ji ber ku girtiyen siyasi bê pergal û hereket bimînin, di êşkencen de wan bi kutek û stûnan ve girêdidin. Ji ber lingan heya bin qirikê kidir li girtî û li stûnê bi şidî tê lefandin û girêdan. Carnan bi rojan û carnan jî bi heftan girtî di vê rewşa girêdayî de dihêlin. Carnan jî girtiyan bi kursiyen hesin ve, bi van kidiran bi şidî girêdidan û elektrik di dan kurşiyê. Bi kesi girêdayî her cûren êşkencen dikin.

### 6 — FELEQE

Cûren feleqan dudu ne:

a) Feleqa dar: Ev feleqî kevnare ye. Dareke qasî 4,5 û metre dirêj û çargoşye. Öşkencekaran felaqê bi taybetî ji darê tuwê an jî, ji darê mazi dane çêkirin. Ü ciyê destan û pê girtinê zirav dane çêkirin. Dar qasî nîv metreyî ji hev dûr in û du qul têde heye. Di van qulikan de bi kindir herdu lingên mirov girêdidin. Du êşkencekar her yek ji aliki ve digir û bilind dikin. Yen din jî, bi ço û copan li binê lingên mirov dixin. Di girtina min de rojê du-sê car min di vê cûra felaqê de derbas kirin.

b) Feleqa tekel: Ev cûra feleqê li gor cûra feleqa dar pir modern e. Ji ber ku mirov nikare xwe bilebtine. Bi temamî mirov bê hereket dimîne. Tekeleke wek tekela taksiyê ye. Girtiyen siyasi tew dikin (qat dikin) û di nîvê tekelê de derbas dikin. Di vê rewşê de ser û lingên mirov dîşîn hevdû. Her du milê mirov dixin valahiya tekelê Yanî dixin cihê lastika ku tê nepixandin. Lingên mirov bi kindir girêdidin. Ü bi ço û copan li bin lingên mirov dixin. Wek li gundên Kurdistanê çawa bi dor sawar duktin, wiha êşkencekarek lê dixe û yê din bilind dike. Di vê cûra êşkencen de, bi tevayı ez 11 carhatim êşkence kirin.

### 7 — ÊŞKENCA BI CERYANÊ

Çar cûren êşkencen ceryanê hebûn. Bi her çar cûran jî, bi min êşkence kirin. Ew her çar cûren ku bi şîn kirin ev bûn:

a) Têleka ceryanê li sitre mirov û yanin jî, li tilî an jî li pêçiya mirov girêdidin. Ü ceryanê beridin laşê mirov.

b) Têleke ceryanê bi destê mirov ve û ya din jî bi pêçiya beraneka lingê mirov ve girêdidin û mirov li ser karsiya hesin didin rûniştandin û ceryan didin laşê mirov. Kursî giş dibe cerryan.

c) Wek guzeke têleke giloviro çêkîrine û wê dikin devê mirov û girê didin. Tela din jî bi sitre mirov ve girê didin.

Makîna ceryanê bi saeten dixebeitin. Dev û zimanê mirov wek komira Cizîrê û Şirnaqê reş dîbin.

ç) Di hemû êşkenceyanan de aleteke wek tipa "T" heye. Êşkencekaran navê wê danîne "Taçoz" û destiyê wê ji boruya ke hesin e. Zirav e û serê dûvikê wê ji tûj e. Têlekê ceryanê pê ve girêdayiye û dixin şuna destava mirova mezin. Tela din li sitre mirov girêdidin. Makîna ceryanê dixebeitin. Heta ku mirov ji daxwaz û pirsên wan re bêje "ere." Ew kesen ku ev cûra êşkencen bi wan tê kirin, êdî zarok ji wan çenabe. Ji mîraniyê dikeve. Cunta faşist, sê caran bi vê cûrana ha êşkence bi min kir.

### 8 — TÎ Û BIRÇITÎ

Bi heftan girtiyan tî û birçî dihêlin. Laşê mirov zuha dibe û ji birçinan dilerze. Paşê ji bo xwarinê û vexwarinê devê min venedibû.

### 9 — XWARINA XWEY

Devê me bi çengan xwey tije dikirin û bi ser de bi tasân av berdida ser. Dibû soravik û asik (made) ûaik li me dişewitan û dipirpitandin. Du car devê min tije xwê kirin û av berdan ser.

### 10 — VEXWARINDANA MÎZE

Dema girtiyan tî û birçî dihêlin an ji xwê dikin devê wan, girtî gelek tî dibûn. Di şuna avê de mîzê bi wan diddan vexwarin. Di meha Cotmeha 1981 ê de — di dema girtina min a carra şesan de — li girtigeha Sertê, du leşkeren faşist ku navê wan yê rastî Hesen û Mehemed bûn; di şuna avê de mîza xwe dane min.

### 11 — VEXWARINDAN Û ŞÛŞTINA AVA TUWALETAN

Ava tuwaleten eskeriyê bi me didan vexwarinê. Ü bi wê ava pîs me dişûsttin. Bi taybetî li girtixana bajare Diyarbekrê, li ser girtiyen kurd, ev metoda ha tim dihat bikaranin. Bi taybetî ew kesen ku li ser navê hêzên kurdî hati bûn girtin bi wan didan vexwarin û wan bi ava tuwaleten dişûsttin.

### 12 — QEDEXEKIRINA TUWALETÊ

Êşkencekaren faşist, ji rojekî heta sê rojan, ne dihiştin ku kes here tuwaletê. Ji xwe piraniya girtiyan nexwesin, iştîyaciya wan zêde bi tuwaletê heye. Hemû birîndar in. Yen ku bi xwe de pîsîti bikira; evcar pîsîtiya wan bi wan didan xwarin. Bi taybetî li girtixana

Sêrtê faşist Samî, vê metoda ha pir bi kar daniya. Ji êşkence, êşkencê fiziki ji me didan ji bûrkirinê. Dema me bibiran tuwaletê ji, heta pêncan dij-martin; divê heta hejmara pêncan mirov karê xwe bigedand. Di êşkence-xana "Kurdoğlu" da min heyâ pêncan karê xwe neqedan. Esker bi copan û çoyan ketin ser min, eskerê ku navê wî "Tarzan" bû di tuwaletê de ez gêj-kirim û ez ji xwe de çûm.

### 13 — ÊŞKENCA BI TORBÊ QÛMÊ

Ji bo mirovên siyasi du cûrên torbê qûmê çêkirine:

a) Torba qûmêya biçük; li dora pênc kiloyî ye. Ji potikên çadîre dane çêkirin. Ji qûma hûr dagirtı ye. Ji bîlî ku bi torban li girtiyan dixin; wexta girtiyan bi destê wan ve dalqînin, torbê biçük bi gunikê wan ve girê didin. Ü dest bi lêdanê dikan.

b) Torbê qûmê yê mezin; Çêkiran na wê wek torbê biçük e. Li dora 20 kiloyî qûm digre. Torbe bi qarça ve dalqandîye. Çav û destê girti girêdayî ne. Girtî li piya didin seknandin, benê torbê ji paş ve dikşinin. Torbe bi hêz li pişt, kèlek û zikê girti dikeve. Bi vê êşkencê perçen nava mirov tev diherişin. Xwîn dikeve nava mirov. Kesênu ku di vê êşkencê de zêde derbas dibin, pirêñ wan dimrin. Di vê cûrê êşkencê de derb û lekêñ êşkencê xuya nakin. Ev êşkence li min ne hat kirin. Hevalêñ girtî yêñ ku li wan hati bûn kirin. ji min re gotin. Çend hevalêñ min bi torbê qûmê şehît ketin.



Ji ber êşkencê ceryanê, tro ji destê Zeynel Abidin brîndar in. Ü rayêñ her du destê wî baş naxebitin. Ji ber êşkencan niha ji Zeynel Abidin, her gav li nexwes-xanê li ba doktoran tedawî dibe.

### 14 — DALEQANDIN

Daleqandin ji du cûr in: Daleqandin bi destan û ya bi lingan.

a) Daleqandina bi destan ji, di nav xwe de dibe du cûr. Cûra yekem; kesen girtî demeke dûr û dirêj, wan bi destê wan ve daleqandî dihêlin. Di vi halî de girtî tazi ye û bi ço û copan ji her ali ve lê dixin. Esker bi singo (xencerâ) li ser pişta girtî, navê wê rîexistina ku girtî li doza wê hatiye girtin, ldinivisine. Çend hevalê wilo daleqandî min bi xwe dît. Heval S. E. ji, ji me re got ku "min çend hevalê weha brîndar bi xwe derman kir."

Daleqandina din ji çarmix e. Darek dirêj datînin ser pişta stûyê mirov, ji bin ve, ji her du destan heyâ girmikan bi dar ve, bi kindir şidi girê didin. Her du serêñ dar pişti ku danin ser her yek dolabeka biliind — di êşkencexana Diyarbekir de ev halet otomatik bû — kursiyê ji bin lingê mirov dikşinin û



Ev, hemû fotograf ji aliyê doktorêñ swêdiyan ve hatine tespit kirin. Di fotografa jorîn de polis û leşkerêñ faşist yêñ tirk, bi qotêñ cixaran laşê Z. Abidin sewitandinê û dax kirine. Ev derbêñ êşkencan hêj tro ji li ser laşê wî hene. Şûn û derbêñ êşkencan bi salan derbas nabin.

mirov bi milê xwe ve daleqandî li hewa dimîne. Di vê rewşa ha ya xirab de ceryanê didin laşê mirov. Av li mirov dikin û copan li her derê mirov dixin. Ji ber daleqandinê û ceryanê hemû rayen (sinirên) mirov, bi taybetî yênil milen mirov tev diperçiqin. Milê gelek girtiyan ji vê êşkencê seget û felc bûn. Milê min jî tro seget in. Diktorê norolijî rapor jî da min. Ez 6 car di vê cûra êşkencê de hatim daleqandin.

b) Daleqandina bi ling, her du lingên girtiyan bi kindir gire didin û qarça ve daleqin. Ji êvarê heta sibê girtî serberjîr daleqandî dihêlin. Dîsa av li girtî dîkin û copan lê dixin.

Li jor ev cûrê êşkencen ku min nivisi. ji bil êşkenca torbê qûmê - ji ber ku hîn dor ne hati bû ser min hevaledî me bi vê êşkencê miri bû - cûrê êşkencen din tev bi min hat kirin. Cara pêncan ku min girtin 20 roj, cara şesan 99 roj û cara heftan jî 58 roj, bi tevî 178 roj, ez di nav agirê êşkencen faşistên tîrkan de mam. Lê min serî ji êşkencekaran re da neni. Ji ber ku ez xwediyê birûbawerî bûm. Tecrûbên min yê kevn hebû û piraniya wan tecrûban ji meletiya min dahatin.

Di êşkencexanen koledaran de bala min pir kişand; li girtiyen kurd pir-pir, qat-qat zede êşkence dikirin. Bi taybetî ger kurd sosyalist an ji çep bana!.. Ev ji êşkencekaran re materyaleke mezin bû. Ew çax êşkencekaran: "Hem kurd û hem ji komünîst e ha" digotin. Û di demeke gelek kin de wî / wê girtiyî dixistin halê mirinê. Bi rastî ferqekî mezin di nav girtiyen kurd û ne kurd de hebûn. Min ev rewşa ha bi çavên serê xwe dit. Di şeva 28.10.1983 ê yan de, ez û hevaledî tîr (H.) bi hev re ketin êşkencexanê. Ew heval 8 rojan di êşkencexanê de ma. Ez 39 roj di êşkencexanê de, di bin êşkencen giran de mam.

Lêdan, êşkence û kuştin qerekter û taybetiyen koloniyâlîzm û fasizmê ne. Ev kar û xebata barbarî û hovîti, jiyan dezgehêwan dirêjake. Hîn ji kin û kurt dike. Li her derê cihanê weha bû û weha ye. Dê li Kurdistanê ji weha be!

Zeynel Abidin  
Adar 1985

Zeynel Abidin, saleke berê, vê nivisara xwe û nivisandi bû. Lê ji ber hilînek sedeman heyâ niha, ew nikari bû nivisara xwe çap û belav bike.

## INTYG

Ang: Zeynel Abidin Kaya 53 02 04

Har haft kontakt med Kaya i en psykoterapeutisk relation vid 18 tillfällen under 1985 i syfte att behandla sviter efter tortyr.

Kaya är född och uppvuxen i Kurdistan- den turkiska delen. I familjeammanesen finns inga indikationer till psykiska störningar. I ammanesuppgifter kring Kayas personlighetsutveckling finns ej tecken till premorbiditet dvs Kaya syns ha varit i god psykisk hälsa innan han utsattes för tortyr.

I Kurdistan arbetade Kaya som statstjänsteman och har även utövat prästyrket.

Han kom till Sverige i slutet av 1984 och alltjämt familj och barn i sitt hemland.

De psykiska störningar Kaya nu företer kan relateras till den långvariga massiva traumatiska situationen han har varit underställd och där flertal fängelsevistelser med tortyr varit utslagsgivande.

Han har fängslats i i totalt 8 tillfällen. Första arresteringen ägde rum jan-81. Vid åtonde och sista gången dömdes Kaya till 5 års fängelse samt 20 månaders fotvisning.

Han har torterats under sammanlagt 168 dagar.

Olika former och arter av tortyr har förekommit.

Tortyren har sträckt sig från brutal odiskriminerad fysisk misshandel till mer raffinerade psykiska individuellt inriktade tekniker. Kaya har en intellektuell livshållning och den selektivt riktade tortyrtekniken med den fysiska systematiska våldet mot hans kropp har fungerat som medel att komma åt hans lissbhållning, idéologi och tro, att bryta ned personligheten och förändra hans identitet.

I hans symptombild ingår nu typiska och karaktäristiska tecken på att han varit utsatt för ett massivt tortyr-tillstånd.--

konzentrationssvårigheter, sömnsvårigheter, störd sömnslätt, persecutoriska tankar,

*Nur Özfır 10/9. 85*

Ev nivisara jorin ku bi swêdî hatiye nivisandin, ji nexweşxana Swêdê rapo-reke doktoran e. Ev rapor di derbarê êşkence ditina Zeynel Abidin Kaya de ye. Doktorên swêdî, di rapora xwe de pêşî, Z. Abidin didin nasandin. Dibêjin, ku ew ji Kurdistanâ Bakûr e. Li welat wek memûr û imam kar kiriye. Abidin 8 car hatiye girtin û her car êşkenceyên giran ditiye. Ew di dawiya 1984- an de hatiye Swêdê.

Di laşê Zeynel Abidin de, gelek derb û brînên êşkencan hene. Bi cûrê êşkencen psikolojîk re, êşkencen fiziki ji hatine kirin. Gelek cûrê êşkencen fiziki li ser li ser laşê Zeynel Abidin hatine pêk anîn. Niha ji derb û birînen nedîti li ser laşen wî hene.

# salnama kurdi

BAREŞ BATÊ

Wek ku tête zanîn, di derbarê yekîtiya zimanê kurdi de çend niçteyên giring hene ku divê em kurd ji bo yekîtiya zimanê xwe, xwe pir bêşînîn û berbihev herin. Ew niqte ev in:

a — Bi yek corê tipan û li Kurdistanê tevde û li deri Kurdistanê ji, bi yek awayê tipan binivisînin.

b — Xebat ji bo nêzikkirina devokên kurdi bêtarmanc kirin û gotinênu ku ne bi kurdî bin, bên paqîkirin.

c — Rêzimanek (gramîrek) yekbûyi bête amadekirin an xebat ji bo vê armancê bête kirin.

d — Zimanek paqî û terminolojîyek çak û pak ji bo zimanê xwendinê, şagirtan û xwendekaran bête sazikirin.

e — Ferhengek bi kurdî û bi tenê ji kurdan re bête çapkirin.

Ew niqte, iro ji kurdan re gelek pêwîst e. Bi vî barî ji, divê rêxistin û komeleyen kurdan bi rêçeve kolektivi rabin. Herkesê ku xwe bi xwe zane û nivîkar e, nikare vî karê giring bi milênu xwe rake. Divê em kurd ji xwe ferî karê sistematiç û kolektîv bikin. Ev xebat divê dibin çavdêriya Federasyon yan ji hinek instituwê zanistî de bête birêve birin. Mebesta min bi vê ev e:

Federasyona Kurd li Swêdê, çend komîteyên demokratîk yêñ hübîjarti, ji bo van karan pêk bîne. Di pey de ji, bi meqamênu Swêd re peyvendîyen xwe çêke, ji ber ku alkariya abori, teknik û civakî bigre. Kesênu ku derê van komîteyan ji bimîne, divê dîtin û pêşniyarên xwe, ji komîte re birêkin. Divê komîte bi awakî demokratîk û li gor sistem û metodên zanistî bîryar bide û wan bîryar û xebatên xwe, di Berbangê de belay bike û kurdan agahdar bike. Bihev şêwîrin çîqas fireh û demokratîk be, dê hewqas bîryar û encama (netica) dawî ji, çak û pak be!

Ez ji niha ve dixwazim, di vê babetê de hinek pêşniyariyê berçav pêşkeş we bikim. Ez ji bo navê mehan vê pêşniyariyê dikim. Min heta niha çend corênu navê mehan yêñ ku min bîhistîye rêzdikim. Paşê li gor dîtin û zanîna xwe, listek nû pêşkeş dikim. Ez daxwaz dikim, ku Fede-

rasyon, vê pêşniyarê wek mînakek (nimûneyek) bigre û vê rê wan niqtê li jor an ji hinek tiştên dîn ên, ku legerin bide ronî kirin Pêşniyariya min a li ser navê mehan ev e: Min hilbijartina xwe li gor lista ku min, di rûpela 5-an de (li gor destnîvisarê rûpel 5 e) çêkiriye pêşkêş dikim.

## PEŞNIYAR

1 — ÇILEYA PAŞÎN: Bi kurdî ye. Rêza Instituyê "Çele-Çile" xweş gotin e, lê li meha 12 an naye. Ji ber vê yekê gotina "çile" û gotinê "pêş" û "paşîn" bi hev re baş dibînîm, ji bo mehîn "12" an û "1" û re.

2 — REŞEME: Bi kurdîya soranî ye. Li kurmancî pir tê. Wek gotina "reşayı" ku benzîhele.

3 — ADAR: Di piranîya rîzan de xwiya dike wek "adar" û ne "avdar" ciyê xwe girtiye.

4 — NİSAN: Ne bi kurdî ye. Lê gelek hatiye naskirinê. Bi soranî jê re "gulan" têye gotin. Lê ew ji, ji meha 5 an re hatiye nasîn.

5 — GULAN: Bi kurdî ye. Ü bi piranî hatiye qebûl kirin.

6 — PÜSPAR: Bi kurdî ye. Ü di rîza soranî de heye û tê bikaranî. Heziran ji ibranî hatiye.

7 — TİRMEH: Bi rastî gelek xweş e û bi soranî ye ji.

8 — BENDER: Bi soranî "xirmanan" tê gotin, lê li gor baweriya min, bênder dê bastır be ji "xirmanan." Dibe, ku "xirman" ne bi kurdî be.

9 — REZBER: Bi kurdî ye. Bi soranî û kurmancî yet maneke dide; rîz û ber.

10 — COTMEH: Bi kurdî ye. Di soranî de "gelarêzan-pelweshen" tê gotin. Pelweshen gelek bastır bû, lê entituyê cotmeh bikar anîye û dibe, ku bastır bibe.

11 — SERMAWEZ: Bi kurdî ye. Baştır e, ji "çirî" û ji "mijdarê." Bêtir bi mantiqî ye û bi soranî ji tê bikar anîn.

12 — ÇILEYA PESİN: Bi kurdî ye. Çêtir li çile û çiliya paşîn ji tê. Ji kanûn pir bastır e.

## Ü EM WEHA RÊZ BIKIN:

SORANI	HÈLÎN-PALE-K.U.K	TEKOŞER-INSTÎTÛ	ZAZAKI	HAWAR	T. K. P. B.	Li gor pêşniyariya min:
1 — Rêbendar	Çileya Paşîn *	Çile *	Zivistana Ortene	Kanûna Paşîn	Berfbarîna Paşî	1 — Çileya Paşîn
2 — Reşeme *	Sibat	Sebat	Zivistana Peyene	Sibat	Reşeme *	2 — Reşeme
3 — Xakelê we	Adar *	Adar *	Usara virene	Adar *	Avdar *	3 — Adar
4 — Gulan	Nisan *	Nisan *	Usara Ortene	Nisan *	Cotan	4 — Nisan
5 — Cozerdan	Gulan *	Gulan *	Usara Peyene	Gulan *	Gulan *	5 — Gulan
6 — Püspar *	Heziran	Heziran	Amnona virene	Hiziran	Püşber *	6 — Püspar
7 — Gelavêj	Tîrmeh *	Tîrmeh *	Amnona Ortene	Tîrmeh *	Tîrmih *	7 — Tîrmeh
8 — Xirmanan	Tebax	Tebax	Amnona Peyene	Tebax	Gelavêj	8 — Bênder
9 — Rezber *	Ilon	Ilon	Paiyîza virene	Ilon	Kewçêrin	9 — Rêzber
10 — Gelerêzan	Çiriya Pêşîn	Cotmeh *	Paiyîza Ortene	Çiriya Pêşîn	gelerêzan	10 — Cotmeh
11 — Sermawez *	Çiriya Paşîn	Mijdar	Paiyîza Peyene	Çiriya Paşîn	Sermawez	11 — Sermawez
12 — Beframbar	Çileya Pêşîn *	Kanûn	Zivistana Virene	Kanûna Pêşîn	Berfbarîna Paşî	12 — Çileya Pêşîn

**BI BERPIRSIYARÊN SAZGEHA  
BÎYANIYAN RE CIVÎNEK**

Komîta Karger a Federasyonê, di roj 10. 03. 1986—an de li bajarê Stockholmê bi berpirsiyareñ Sazgeha Bîyaniyan (Invandrarverk) re civînek pêk anî. Ji bil du berpirsiyareñ Sazgeha Bîyaniyan, berpirsiyareke ji, ji Sazgeha Komelêni Bîyaniyan li Stockholmê (Invandrarförfatning) ji besdarê ci-vîne bû.

Di vê civîna ha de, li ser pirs û pîrgirîkên Federasyonê, komelêni endam û li ser bûyera Olof Palme hat peyvandin.

Ji bo xebateke baştir û aktîvtir û dagerandina Federasyonê, Komîta me ya Karger û berpirsiyareñ Sazgeha Bîyani bi hev re bîyara kurseke perwerde dan. Ji endamêni Komîta Karger û ji ya Çavdêr, dê 4 kes di rojêni 20-21. 03. 1986—an de li Stockholmê besdarê kursa perwerde bibin.

**ROZET Û ALA KURDÎ DERKETIN**

Federasyona Komelêni Kurdistanê li Swêdê, çend meh berê ji ala kurdan 1000 rozet dabû çêkirin. Federasyonê, ji van rozetan qasî 100 hebi, ji pêşmîrîgen Kurdistanâ Başûr re diyari kir û şande Kurdistanê. Yen mayîn ji di nav çend heftan de qedîyan. Federasyonê niha cardin ji nû ve aymî rozetan daçêkirin. Rozet gelek biçük û spesîye. Meziniya wê 9x 15 mm. ye. Rengê zer avzîr e. Li singa mirov dibirê! Bihayê rozetê 15 kronê swêdî ye. Hun karin bi perêni pêşîn ji Federasyonê bixwazin.

Herweha Federasyona me, li Swêdê bi karxana çêkirina al re peyvendi danî. Wek alen hemû dewletêni fermî ji hevrişim 10x15.. cm cargoşe al da

çêkirin. Bihayê ale 60 kronê swêdî ye. Kesêni ku bixwazin karin rozet û ale ji navnişana Berbangê daxwaz bikin.

**KOMELA KURD LI BOTKYRKAYÊ  
JI BO BIRANINA PALME KAMPAN-YA BERHEVKIRINA İMZAN VEKIR**

Komela Kurd li Botkyrkayê, ji bo biranina serokwezirê Swêdê Olof Palme kampanya berhevkirina imzan vekir. Komela Kurd, li navgîniya Fittjayê,

**Geli xwendevanê hêja!**

Di roja Kuştina serokwezirê Swêdê Olof Palme de, komcivîna Federasyonê ya salewextî pêkdahatin. Bi bîhistina bûyera Palme Komîta Karger a Federasyonê, komcivînê îptal kir û Meheke şunde avêt. Komîta Karger di cî de civîya û bûyere di çav de desbaskir Komîta Karger, bîyara telgirafê serxwesiye û berketinê girt. Komîte di eyîn rojê de, ji hukumetê Swêdê re, ji partiya Sosyal Demokrat re û ji malbata Palme re cûda cûda, bi zimanê Swêdî ev telgirafa jêrin şand. Kurdiya telgirafê weha ye:

"Kuştina Olof Palme ji bp ïnsanetiye sîceki ye Em li ser vê cînayeta ha şoke bûn. Palme, li Swêdê û li cihanê tekoşerekî aştîxwaz û yê wekhevîye bû. Mirina Palme, ji bo me hemûyan wendabûnek e. Gelê kurd, Palme wek dostekî xwe diditîn û nasidikirin.

Em, ev kuştinêni kesen politîken ku li Swêdê û li cihanê tênen pêkanin protesto dikin, mahkûm dikin. Bi kuştina Palme, em xemgîn in, tesireke mezîn û kûr li me kir."

**FEDERAŞYONA KOMELEN KURDISTANE LI SWEDÊ**

TLX17820

SVENSKA REGERINGEN  
STOCKHOLM

SOCIALEDEMOKRATISKA  
ARBETAREPARTIET  
STOCKHOLM

FAMILJEN PALME  
STOCKHOLM

MORDET PÅ OLOF PALME ÄR ETT BROTT MOT MÄNSKLIGHETEN. VI ÄR CHOCKADE  
ÖVER DENNA ILLGÄRNING. PALME VAR EN KAMPE FÖR FRED OCH RATTVISA I  
SVERIGE OCH ÖVER HELA VÄRLDEN. HANS DÖD ÄR EN FÖRLUST FÖR OSS ALLA.  
KURDISKA FOLKET BETRAKTADE PALME SOM EN AV SINAS VÄNNER. VI

BIT8353 SVENSKA PAGE 2/28

FÖRDÖMER STARKT DETTA OCH ALLA ANDRA MORD PA POLITIKER SOM HAR  
BEGATTS I SVERIGE OCH ANDRA LÄNDER. VAR SORG FÖR PALMES DÖD ÄR DJUP.  
KURDISKA RIKSFÖRBUNDET I SVERIGE

Bestyrkt avskrift/kopia av telegram  
originalt utfärdad på begäran av av-  
sändaren/adressaten (eller ombud)

Telegramoriginalt inlämnat 1/3-86

Stockholm den 1/3-86

Avsn. Maria Eriksson

çend roj li ser hev masa berhevkirina imzan vekir. Bi sedan kes besdarê kampanya imzayê bûn. Serokatiya komelê, ji berhevkirina imzan, fotokopyek da berpirsiyare Partiya Sosyal demokrat a herema Botkyrkayê.

KOMELA KURD LI UPPSALAYE  
LI SER KUŞTINA PALME SERXWE-  
ŞI DA SOSYAL DEMOKRATEN UPP-  
SALAYE

Komela Kurd li Uppsalayê, li ser kuştina serokwezirê Swêdê û serokê Partiya Sosyal Demokraten Swêdê Olof Palme bîyar girt, ku serxwesiye bi-de Partiya Sosyal Demokrat liqê Uppsâle. Komîta Karger ya komelê bi qasî 300 endamê xwe ve, bi zerzeng û fotografen Olof Palme ve meşîyan û cûn xaniyê Partiyê. Serxwesi dan berpirsiyare Partiyê. Bersîrsiyare Partiyê, li ser vê bûyera ha gelek dilşa û spasdar man.

**VEŞARTINA OLOF PALME**

Di 15 ê meha 3 yan de, ji bajarê Stockholmê, cenazê serokwezirê Swêdê yê kevn Olof Palme, bi merasimeke gelek mezîn hat veşartin.

Di merasima veşartina Palme de, serokwezir, serok û berpirsiyare gelek dewletan besdar bûn. Li qeraxên riya ku cenazê Palme tê de derbas dibû, qasî 15 milyon mirov berhev bibûn. Federasyona me ji, li Norra Bandoriet Flama û ala kurdî vekir.



Di roj 8 ê Adarê 1986—an de 10 federasyonêni bîyaniyan li bajarê Stockholmê, li meydana Sergels Toriet, bixwemîşandaneke gelek mezîn Olof Palme bi bir anîn. Federasyona me ji di nav van deh federasyonan de bû. Di mitîngê "Biranina Olof Palme" de hejmara kurdan gelek bilind bûn.

Li ser navê deh federasyonan serokê Federasyona Yugosaviyan axaftinek kir. Ü li pey wî ji, wezirê karîbaran derveyî yê Swêdê Sten Andersson peyvî. Andersson, ji federasyonêni bîyaniyan re silavêni Sîl Lisabet Palme anîbû. Di mitîngê de qasî 10 hezar kes besdar bûn.



Di 8 ê Adarê Roja Jinan de, hemû rîexistinêni jînêni swêdiyan û yêni bîyaniyan yêni ku li Swêdê ne, roja xwe kirin roja "Biranina Olof Palme." Hemû rîexistinêni jînêni dîsa li meydana Sergels Torietê civiyan. Olof Palme bi bir anîn. Komela Jînêni Demokraten Kurdistanê ji besdarê civîne bû. Televizyonâ Swêdê bi jînêke kurd re hevpeyvînek kir. Di fotografa jorîn de hun Komela jînêni Kurd dibînîn.

# bizawa şex seid

S. QERECDAX

Di dîroka Kurdîstanê de gelek bûyerên bi rûmet hene ku heyant gelê kurd dom bike, dê van bûyeran nêñ ji bîrkirin û her tim û tim dê ewana di tekoşîna serxwebûn û azadîya gelê kurd da bêñ bîrânîn. Ji bûyerên herî girîng yek jî, di dîroka Kurdîsnê da bi navê Serhildana Şex Seid tête naskirin.

Hereka Serhildana Şex Seid, di dîroka Kurdîstanê da xwedî rûpelên bi rûmet û qîmet e û yek ji hereka netewî ya kurd e. Li ser vê bûyerê gelek tişt hatine gotin û nivîsandin. Maxabin, ku heyant vam şend salêñ dawîyê li ser vê buyerê lêkolnên objektif dirist û têkuz nehatine kirin. Mirov dikare bi hêsatî bibêje ku van "lêkolnên" bi piranî, hereka Şex Seid paşverû, kevneperekît û lîstikektî Ingiltzan dabûn nîşandan. Lê, lêkolnên ku di van salêñ dawî de hatine kirin, lêkolnên têkoz in. Rengê netewayetîya vê herekê xistine holê û bi westqe û belgên zanîn şan dane ku ev hereke ne bi ti-liya Ingiltzan pêk hatîye, şewte wê, di vê bûyerê da Ingiltzan dan û standin bi hukûmeta Mistefa Kemal ra danîne û heta piştgirîya wan kirine da ku hereka netewî serfîraz nebe û têk biçe.

Armanca vê nivîsê, lêkolnêk nûh û fireh nîne ye li ser hinik lêkolnînan rexne girtin jî nîne. Tent armanca vê nivîsê ew e ku ji bo salvegera vê hereka netewî ya kurd, bi kurtî bi bîrbîne û pêşkêşî xwendevanan bike.

## BI KURTÎ BINGEHÊ HEREKA SÊX SEID Û DÎROKA SERHILDANA WÎ

Ji bo têgîhîstina bingehê hereka Şex Seid û rengê vê serhildanê pêvîst e ku meriv rewşa gelê kurd ya wê wextê bîne ber çawan. Wexta mirov bi kurtî be jî dema dîroka ciwata kurd ya 1920-1925'an bîne ber çav, suretekî weha dibîne:

Pîstî serê cîhanê yê yekemîn dewleta Osmanî qels ketibû û rewşadewleta Osmanî tevlîhev bûbû. Tesîra fîkrê netewî li nav gelên bindest û yên kolonî ku girêdayî

împeratoriya Osmanî bûnbelav bûbû, piranîya gelên bindest li hember Osmanîyan şer kiribû û gîhabû serxwebûn û azadîya xwe. Lê, gelê kurd ji ví mafî bê par mabû û negîhabû azadîya xwe. Ji alî dîn ve, bayê serxwebûn û azadî yê di nav gelê kurd da jî belav bûbû û tesîrek mezin hiştibû. Edî liv li gelê kurd jî ketibû. Ü li gora şertîn wî zemanî di nav gelê me da jî xebatêñ rîexistinî destpêkiribû. Ji van xebatan yek jî damezrandina rîexistina AZADÎ bû.

Di bin serokatiya mîralay (qu-mandar) Xalit Begê CIBRÎ da û bi tevlî mebûsê Bedlîsê Yusuf Zîya û gelêk ziftiyêñ kurd li bajarê Erzerûmê di 1922'an da rexistina AZADÎ damezirandin. Didemekî kurt de li Bedlîsê, Da-rehenê, Xarpêtê (Elezîzê), Ruhayê (Urfa), Dîyarbekirê, Sêrtê û li gelek herêmîn Kurdîstanê da şûbêñ rexistina AZADÎ sazbûn. Li her alîyê Kurdîstanê, ji bo avakirina Kurdistane kî serbixwe gelê kurd û bi taybetî zana û pêşevayêñ kurd dixebeitîyan. (Binêre pirtuka Dr. Beytar Nûri Dersimî "Di dîroka Kurdîstanê da Dêrsim")

Hereka Azadî, xebatêñ xwe bi dizî didomand. Pêşengên Azadîyê û bi teybetî serokê Azadî Xalit Beg, ji bo piştgirî sitandina serokesîrîn bi wan re pêwendî danî û ji bo pêkanîna dostanîya wan xebiti. Ji wan mirovên ku xwedî qesr û qîmet bûn û têkili hatibûn danîn yek jî jê, Şex Seid bû.

Di zivistana 1923-1924'an da pêşevayêñ kurd li Palo civînek çêkirin û ji bo domandina xebata dizî biryar dan. Hinik serokesîrîn Xormikê ji wan xebatan haydar bûn û ewana bi xwe piştgirîya hukûmeta Mistefa Kemal dikir û di babeta xebata serhildanê da jî M. Kemal agahdar kirin. Li ser vê

agahdarîyê hukûmeta M.Kemal, Xalit Beg û hevalên wî Yusuf Zîya û Hecî Musa Beg girtin û şandin girtîgeha Bedlîsê.(Binêre pirtûka"1925-Serhildan Kurd-Hereka Şex Seîd" nivîsa prof.M.A.Hastretyan, weşanxana Jîna Nû)

Piştî girtina Xalit Beg, Şex Seîd serokatîya hereketê girt ser xwe. Lî, hukûmet ji xebata Şex Seîd jî haydar bû.Loma dema mehkema Xalit Begê dest pêkir, dadgeha Bedlîsê xwest ku îfadê Şex Seîd jî bistîne. Şex Seîd vê daxwaz dadgehê qebûl nekir û kalîti û nexwaşîya xwe asteng nîşanda. Niyeta dadgehê jî ew bû ku Şex Seîd jî dekan bînin mehkemê û wî jî bigrin û tewkîf bikin.

Ji bo sitandina alîkarîyê û xurtkirin û firehkirina serhildanekî xurt, Kurê Ş.Seîd Elî Rîza, di meha 11'an a 1924'da çû Dîyarbekir û Helebê û bi pêşevayê naskirî yênd kurd ra civînan pêkanî. Di civînan da kurdên bêsa Tirkîyê, Irakê û Suryê besdar bûn. Di van civînan da biryar sitandin ku destpêka serhildanê dê di Newroza(21 Adarê) 1925'an da be û ji bo serketina serxwebûna Kurdistânê, li ser pêwîstîya serê çekdarî jî sekinîn û biryar dan.

Lî, mixabin di civata kurd da yekîtî û piştgirtîyekî xurt tinebû û ev pêk jî nehat. Civata kurd da axa,beg,eşîr û şex hebûn û dubendîtî û berberî ji berî ve di nav wan de dom dikir. Ji alî din ve berberî di nav kurdên elewî û sunî da jî hebû. Ji bo rabûna vê berberîyê di nava sunî û elewîyan da û ji bo yekîtîyekî xurt di nav kurdan da, bi teybetî Şex Seîd xebitî, pêwendî bi serokêñ elewîyan ra danî. Lî çi fêde ku di vî warî da negîha armanca xwe. Wek mînak em dikarin hinik eşîrîn Dêrsimê nimûne nîşan bîdin, ewana li hember serhildanê li gel M.Kemal xebitîn û berê çekê xwe dan kurdan.

Di nava bûyerên pêşveçûna serhildanê da tê fehmkirin ku leskerên Romê(Tirk) teqîbat dane ser Ş.Seîd, loma dema Ş.Seîd bi tevlî

gurubek hevalên xwe ve ji hêne derketin çûn Pîranê, 10 eskerên tirk û 2 serlesker(üsteğmen Hüsnî û teğmen Mistefa) hatin gundê Pîranê mala birayê Ş. Seîd cem Ebdirrehîm û ji Ş.Seîd teslimkirina 10 kurdên "qaçax" xwestin. Ev 10 kurd jî hevalên Ş.Seîd bûn. Armanca xwestina van 10 kurdan ew bû ku leşgerên tirk provakasyonekî pêkbînin û her weha bernama serîhildanê tevlîhev kin û fersend nedîn da ku hezirîya serîhildanê bête pejirandin û wê, serîhildanê bi awakî xaw hilweşînin. Di dawîyê de jî weha bû û hukûmeta Romê gîha armanca xwe. Şex Seîd wan 10 kesan neda leşgeran û ji wan ra tîka(rica) kir ku leşger pevçûnek çênekin. Lî leşkerên Romê pîlana xwe berî çekiribûn û dixwastin wê têxin jîyanê. Leşgeran îsrar kirin û dawîyê da ser çêbû,çend leşger û yek serlesger hatin kuştin û yên din jî dîl(êşîr) ketin. Ev bûyer di 8'ê Sibata 1925'an da çêbû. Ş.Seîd dizanibû ku gel hîn ji serîhildanê ra amada nîne û wî dixwest ku ev bûyer tenê li wê herêmê bimîne, belav nebe,da ku dinav gel da bikaribe xebata rêxistinê çêke,ji ber vê yekê Ş.Seîd ji gund derket û li gel hînik hevalên xwe çûn Darahêne ber Şex Seîd.Bi vî awayî bûyerên Pîranê û Lîcê bû sedemê serîhildanekî zû û ne di wext da. Piştî wan bûyeran Ş.Seîd pêşveçûnen ji ber xwe ve dît û têgîhist ku ji neçarî divê dest bi serîhildanê ke û weha got: "-Tê dîtin ku qedera me weha ye."

Di 14'ê Sibatê da li gel Ş. Seîd ji 10 hezar zêdetir hêzên kurd yên çekdar dest dan ser Darahêne, qeymegam û memûren tirk dîl kirin, serokê eşîra Modan Feqî Hesen kirin qeymegamê nû û bi mûaqet Darahêne kirin peytext, ji bo sazumana kar û baran jî qanûnekî muaqet çêkirin.

Pêvîst e ku mirov li ser nuqteki girîng jî bisekine, Ew jî ev e ku di mintiqêñ ku ketin nav serîhildanê û li wir çerkez,ermeñî û ereb dijîyan. Ewana jî bi piranî çekêñ xwe girtin û piştgi-

rîya birayêن xwe yên kurd kirin. Ermeî, ereb, çerkez û hwd. wek gelê kurd ji her mafêن xwe yên mirovatî û jîyanê bêpar bûn, teda û zilma hukûmeta Komara Tirk ya nû di jîyanâ xwe da didîtin. Jîyan ji bo wan jî bûbû wek cehenemekî û kîr gîhabû hestî, loma ewana jî, ji ber xwe ve ketin nav serîhildanê.

Ji çar alîyê herêmên serîhildanê pêşveçûn û serfîrazîya gelê kurd, 2 mehêن ewil gelek baş bû. Ew pêşketin û xurtbûn qurf xistibû kezeba hukûmata Tirk. Loma di hukûmatê da jî guhertin çêbû,

İsmet Înöñî bû serokvezîrê nû bi alîkarîya eşîrêن kurd yên cehs ve hovîtîyekî mezin li Kurdîstanê pêkhat. Bi hezaran mîr û jin, zarok-zêç, kal û pîr hatin kuştin, bi sedan gundêن Kurdîstanê hatin şewitandin, wêran bûn...

Di dawîya têkçûnê da Şex Seîd jî êdî zanîbû ku mecala berxwedanê nîne ye û ji bo vê yekê wî xwest ku bi hînik hêzên xwe ve di pira Ebdirehman Paşa da li ser mintiqa Bulnixê here derbasê Iranê bibe. Lê pir mixabin hevalê wî yê ku di nav hêza wî da bi xwe bû, mirovekî cehs bû û ewaya di vî warî da ordiya Tirk agahdar kiribû. Ev cehsê mezin, ji mintiqa Cibrê bînbaşî Qasim bû. Dema Şex Seîd û hevalên xwe hatin ser pirsê, carmedorê wan ji alî ordiya Tirk ve hat girtin. Bînbaşî Qasim bê berxwedan hemâ destê xwe bilind kir û teslîm bû, Şex Seîd û hevalên wî li Romê teqandin, lê êdî berxwedanekî badilhewa bû. Ş.Seîd û hevalên wî hatin girtin, wan anîn girtîgeha Dîyarbekirê, di 27'ê Nîsana 1925'an da.

Dadgeha Dîyarbekirê biryara dardakirina Şex Seîd û 47 hevalên wî dan. Di 30'yê Hezîran 1925' an da Şex Seîd û hevalên wî hatin dardakirin. Bê guman gelek mirovêن ku neketibûn serîhildanê û endamên

herekêن kurd nebûn jî hatin dardakirin. Tenê gunê wan ew bû ku ewana zana bûn, ronakbîr û berî her tiştî kurd bûn. Piştî bi dardakirina Şex Seîd, li Kurdîstanê

qetliamên gelek mezin pêkhatin. Lê gelê kurd dest li doza kurd û Kurdîstanê berneda, li çîyayêن Kurdîstanê ala serîhildanê û a-girê serxwebûn û azadîyê her tim bilind kirin, geş kirin. Her wek mînak, li çîyayê Sasonê Mehemed Elî Unis, Agriyê serok eşîra Ce-lalî Berho, Cebexçûrê serokesîra Mistan Omer Mahî hîn Jî şerê berxwedanê didomandin...

Gora bîrûbawerîya min, sedemê têkçûna serîhildana netewa kurd ya herî giring ew e ku, gelê kurd, hîn di warê rêexistinî de hazir nebûbû û dubendîtiya di nav eşîrêن kurd da ku hebû jî, mala gelê kurd xirab kir. Ez wek mînak dikarim navê çend eşîrêن çehş bidim xwîyakirin ku ewana bi bê-bextiyekî mezin li gel hukûmat M.Kemal xebitîne û li birayêن xwe yên kurd xistine. Çend eşîrêن çehş evin: Xormik(Varto), Mutkan(mintiqa Bedlisê), Heyderan û Ademan(mintiqa Vanê), Begleren Xarpêtê(ewana dema hêzên Şex Şerîf û Yadîn Paşa dor ji Xarpêtê standin û zept kirin, alîkarîya hêzên kurda kirin, lê, piştî paşve vekîşîyan, içar van begleran alîkarîya ordiya Tirk kirin), di Xarpêtê da eşîra Dêrsimê Şarkî, ji Xarpêtê eşîra Şadan, li mintiqa nêzîkê Palo eşîrêن Hîran, Lolan, Izolan û Soran(bi teybetî li mintiqa Xarpêtê, Paxirmedenê û Erxenîyê sedemê têkçûna hêzên Yadîn Paşa û Şex Şerîf, eşîrêن çehş yên wê mintiqê bi xwe bûn. Şex Şerîf jî bi destêن wan cehsan hat girtin) û hwd. hwd....

Divê em gere serîhildana Şex Seîd ji bîr nekin, bi giranî şehîdîn Kurdîstanê bi bîrbînin û ji serîhildanê dersêن gîring bistînin.

NOT: Min hezirkirina vê nivîsê da ji pirtûka bi navê "Serîhildana Kurd 1925-Hereka Şex Seîd" Weşana Jîna Nû û bi teybetî pirtûka Dixtor Beytar Nûri Dêrsimî bi navê "Di Dîroka Kurdîstanê da Dêrsim" fêde sitand.

# TOLERANS—BAWERİ Ü RONAHİ

C. S E R O

Li Ewrupa, di dema 1700 de dêr û dewlet li hember ramanê demokrasî û ronahiyê radiwestan. Bê şik burjuvaziyê Ewrupa, wê wextê tekoşîn li dij feodalîmz û kevneperestiyê dida. Ew dem bi navê felsefa demokrasiyê tê naskirin. Ol û dewlet divê ji hev cûda biba, ilm û zeka hakimê jîyanê biba. Heta wê wextê, di warê rewşenbiriyê de, di felsefe û ilm de metodên skolastik û munaqşe ciyekî giran û giring digirtin. Lê bi felsefa ronahiyê re zimanê ilmî, bû zimanê matematikê û ilm bû beşike dagerandina civatê. Perwerde û exlaqekî nû pêk hat. Fikrê rasyonel û xebata pratîk, wekî çêkirina anşiklopediyan, komkirina zanistiyê pêşve çû. Fikrê demokrasi, wekhevi, biratî, azadî û toleransî belav bû û hate serüberkirin.

Xweza, welatê me û mirovîn me di wê demê de ji merçen rîzanî, aborî û civakî ji wê pêşketin û pêşveçûnê bêpar ma. Wek di her babetî de, di vê babetê de ji di civata me de munaqşe ne hate kirin. Dewlet û hêzên koloniyalist, imkanan ne dan ...ku li Kurdistanê xebateke weha pêk bê. Ji ber vê yekê ji, heta iro li ser gelek dijêtî û nelehevhatiyêن bicûk, bûyerên gelek mezin çêbûn. Hêzên welatparêz û netewî li ser pirsên rojanê yêñ bicûk û ne hêja gelek hev êşandin û dêşinin. Heta hinek bûyer, birînêñ mezin û giran di civata kurdâşyekir. Dermankirin û xweşkirina wan birfinan dê bi salan ji bigre. Sedem ji, ji ber ku di warê siyasi de, ditinêñ cûda di nav hêzên me de hebûn û hene. Yek ji yekê din re qet tolerans şan nade.

## TOLERANS

Filozofê Fransi Francois Marie Arauet De Voltaire — 1694-1778 — heta roja iro ji, ji bo toleransê bûye sembol. Wî di dema xwe de, li dij dewlet û dêrê şerekî dijwar da. Voltaire, ji bo azadiya weşan, azadiya rîexistini, bawerî û ya ramanê xebateke gelek hêja kir. Voltaire, li dij fanatîzmê û diktatoriyê, şerê demokrasî û toleransî da. Li gor wî filozofê ha, ilm û rasyonalizm, kultur û sivilayeti, divê ji bo fikrê toleransê xebat bikin. Şer û barbarî (hovîti), durutî û derew di bingehê xwe de hevalê bê toleransiyê ne. Mirovê bê tolerans daxwaz dike ku her kes wek wî bifikire. An ji mafê wî û jîyanê nîn e. Mirovê bê tolerans dibêje: "Wekî min bifikire an ez dê te bikujim." Mirov kare li dîrokê mîzeke, di wê demê de, beriya wê û niha gelo mirovîn bê tolerans kî ne? Mogolîn hov û kovî ku Kurdistan talan û wêran kirin. Iskenderê mezin, Sezar, Nero, padişahîn Osmaniyan, Faşistîn har Mussolini û Hitler, Ataturk, Evren û hevalbendêñ wan uhw... Ramanê toleransî, li cihanê tûcarı ne bûye sedemê şer û mîrkuyîyê. Her gav mirovîn bê tolerans dest bi derxistina şerê û pevçûnê kirine û xwin rijandine. Cihanê kirine gola xwinê. Gelek caran baweriya du kesen hevrê an ji welatparêz ne wek hev bûne û hev du ji navê rakirine. Fanatîzm wusa xerabe ku du bira mezelîn hev dikolin, bav lawê dukje! Ji ber ku mirovê fanatîk dixwaze her kes wek wî wê bifikire. Kesê fanatîk di bingehê xwe de individualist ( egosist- xwexwest) e. Bê toleransî her gav hevalti-

ya bê bexti, durutî ye. Derew û sextekarî ye. Koleti ye. Voltaire dibêje, ku " bi derewan, wexteke gelek dirêj mirovan xapandise. ( r. 70 )

Mirovîn ku li dij toleransî ne yêñ virker in. Wezirê Hitlerê faşist Goebel, digortin ku; " dereweke baâ bê tekrar kirin, dibe rast."

Mirov kare, ji vê hevoka wî, ev encam derxe; ferqa rasî û derewan tune. Rast kare bibe direw û derew ji kare bibe rast. Spî kare bibe reş. Elî kare bibe Welî. Sextekarî kare bibe welatparêz... Nihilizm û bê toleransî her du hevalen hev in. Û hev du xurt dikin.

Voltaire, bawerî bi metoda qanîkirinê ( iknakirinê ) dani. Mirov bîrûbaweriya xwe, nikare bi darê zorê bi kesen din bide qebûlkirin. Bawerî bi riya qanîkirinê pêk tê. Voltaire dibêje, ku " tiştîn ku tu dibêji, ez qet na ecbînim, lîbelê heta mirinê ji, ez dê mafê xweparastinê bidim te." ( rû. 14 )

Voltaire, di teorî û pratîka xwe de gelek rast û durist bû. Wî tiştîn ku digot û tiştîn ku dikir, hev du digirt. Di dema xwe de ditinêñ Voltaire ji bo xebatê ilm û kulturi bûn minak û rînas. Ji dema Voltaire heta iro du sed sal derbas bû. Divê mirov wî li gor dema wî,bihêjîne; ne li gor iro.

## TOLERANS JI BO KI?

Her ditin bi xwe re hinek pîvan tîne. Bîrûbaweriye aktülize ( rojane ) dike. Tolerans ji li gor rewşa civakî û siyasi kare bêt guhartin. Tolerans, ne sistî û ne ji liberalizmekî zoraki ye. Ji ber vê yekê mirov kare pirs bike, " tolerans di civata kurdan de ji bo ki ye? " Hinek bîrûbawerî hene, ku zerarê didin toleransî, mirovahiyê, welatparêzî û sosyalizmê. Di civata kurd de, divê tolerans, ji bo hêz û kesen welatparêz be. Ji bo yêñ çep be. Ew kesen ku li dij dewlet û hêzên koloniyalist û paşverû ne, divê karibin di nav xwe de bi şêweki azad ditinêñ xwe bêjin û li ser gelek babetan bi hev re munaqşe bikin. Hemû xebat ji bo azadî, ser-xwebûn û rîzgarkirina Kurdistanê be. Bê guman divê munaqşe bêt kirin ku çewt û rast ji nav hev derkevin û doz baş bêt vekirin û zelal bibe. Reş û spî ji hev bêt cûda kirin û riya tekoşînê vebibê

Sosyologên Elman Max Horkheimer û Thedor W. Adorno di pirtûka xwe de, dibêjin, ku armanca xwebata ronahikirinê azadkirina civatê ye. Li gor van nivîskaran, peyva ronahiyê û ya rastiyê gelek nêzîkî hev in. Armanc, pêk anîna mirovê azad, xweser û ronak e. Divê berî her tiştî mirov bibe xwediyê xwe û bibe mirov. "Programma felsefa ronahikirinê, paqikirin û zelalkirina cihanê bû. Wan dixwest, ku mitoloji ji hev belav bibe û şûna xapandinê zanyari bigre. ( rû 17 ).

Zanistî û nezanî, buhişt û dojeh, havîn û zivistan, jiyan û mirin her gav bi hev ve girêdayî ne. Her gav di navbena wan de tekoşîn berdewam e. Ji ber vê yekê divê mirov karibe bi awakê demokrat, li ser bîrûbaweriyeñ hev munaqşe bike. Hinek kes hene ku gelek caran dixwazin rî Dûmahîk rûpel 21

## ÇİROK

# WINDAYO

BAVÊ NAZÊ

Birîn di laşê ciwan de çiqas kûr û fireh be, heger ne ya mirinê be, wê bighê hev, lê teví wiha ji birîn xwe di laş de dihêle.

Di xwiristê de; nabêna du kaşan de hewaleke teví ku demekê herdu ciya yekbûn ji tu hêzûnê nikaribe wan bigihîne hev

Lê ku hat û dar ji rehêن xwe bêt birîn tu car nema şin tê. Lê ku dema dar teví rehêن xwe tê rakirin û li cikî din bê çandin, wê jyana xwe berdewam bike, teví ku di destpêkê de peleñ wê zer dibin û carna ji diweşin, lê hindik-hindik rehêن xwe bera zikê erdê dide û ji nû ve şin dibe û kat dide. Di vir de şertek heye, divê dar bê çandin di axik mîna xweliya xwe de, yan ji nêzîkayî lê bike. Heger ne wiha be, bê guman, wê dar biçilmise û hêdi-hêdi bi aîlî hîşkbûnê, mirinê ve here.

Ev tiştên han li ser şînkayêñ xwiristê tên gotin. Lê ku hat û insan ji refê xwe ma? Gelo wê karibe jyana xwe mîna berê berdewam bike? Bi xwe em zanin dema çûk ji refê xwe di mîne, dibe qîsmetê qertalan. Û yan ji birçibûn û qesflandinê xwe davêje bextê insan. Di vir de ne dûr e tê keve nav lepêñ pisikê û yan ji nav destê kurekî ku ji ba xwedê li nêçirekê digere. Di herdu halan de çûk wê mirinê bi çavêñ xwe bibîne

Lê ku hat û tulûrê hur ma bi tenha xwe ( li gel ku ev celebêñ tulûran bê ref in), demek dirêj diponije, heyâ këflîka ber mirnê bilind difire .. difire. Dema ji ber çavan dikeve gewdê xwe sisit dike û bi kevirekî xwe berdide erdê.

Ü díasa li ser van tulûran; ku hat û ew ket nav lepêñ insan de? Çaxa ew xwe dibine di rewşa diliti de xwarinê naxwe heyâ mirnê. Loma dibêjin; dema tulûrê hur di cengê de neyê kuştin, ew bi xwe xwe dide kuştin.

Ü hene hin tulûren mîna wan bi gewd û rengêñ xwe, lê dema dikevin rewşek teng, dest ji meznatiya navê xwe ber di din û mayîna xwe di jiyanê de li ser sergo û beretan didomînin.

Lê ku hat û insan ji refê xwe ma, gelo wê ci riyê bide ber xwe? Wê bi çûk be, yan wê bi tulûr be, yan ji wê qertelê li ser berata be? Ne dûr e ku wê yê pêşî be, yan ji yê navin be, yan ji yê sisiya be. Gelo celebekî din ji xeyni van celeban wê hebe? Gelek karin bi "na" bersivê bidin, lê ezê hewledan bikim ku merovekî bi wan bidim nasîn bi kirasekî din, rengêñ din û bi navekî din::

Navê wî Windayo bû. Ev nav pê ve zeliqî pişti vegera wî ji welatê biyanyan... Demek dirêj tê re ne çû, navekî nûn bi du ket: Gêjo... Ü dure bê hejmar nav bi du ketin, dawiya wan; Dîno bû.

Dema Windayo, yan Gêjo, yan Dîno dimeşîya, kesen wî diditîn ji hev re digotin:

— Lê binêr mal xerabo serê xwe ji erdê ranake! Tu dibê qey tim û tim li tiştekî digere.

Piştî van gotinan navê wî ma Windayo.

— Lê binêr, mîna gêja dimeşî. Ü ev ji ji xwarina goşte be-

rêz e ilmê şeytanfye.

Ü hin kes hebûn digotin:

— Xwedê muinçê wî be. Jin û zarokêñ wî pê re nehatin. U livir kar û ci ji xwe re nedît. Ne dûr e ku aqîlê xwe berde.

Ü di dema dawî de zarokan, bi hê-hê û keviran, bi pey diketin.

Windayo ev gotinêñ han dadiqtand û di ber guhêñ xwe re berdida

Lê nexweşiyêñ Windayo ne ev tenê bûn. Iro ji hemû rojan bitir wî ci ji xwe re ne didît, çimkî namek ji jîna xwe girtibû. Namek wek hemû naman bûn, lê çar suretêñ zarokan di nav de bûn. Li bin wan hatibûn nîvisandin: 'Kîjan ji wan ê te ye? Tê bîra te, te zirt û fortê xwe dikir û digot: Dola me Kurdan li hemû derê xwiyaye."

Windayo li yê pêşî nêri hinek ji şewêñ xwe tê de dit, lê dilê wî lê rûnenişt. Di yê dudwan de çavêñ wî, yêñ wî bûn. Di yê sisîyan de dev û bêvil mîna yêñ wî bûn û di yê dawî de çen û eniya xwe tê de naskir. Lê çiqasî Windayo bêtir li wan temasidikir, wilo ji bêtir dilê wî li wan dişeteet!

Windayo xweş nasdikir, ku yek ji wan zarokan ê wî ye. Lê kîjan? Windayo bi dil û can dixwest, bi berê xwe yê yekem şâ bibe, lê nikarî bû. Dixwest ê xwe hembêz bike ramisanekê jê bistîne, lê dilê wî bi awî nedikir. Lewra di wan de didît ê xwe û ne yê xwe û bi vî hawayî zarokê ji pişta wî dibû ne yê wî. Di vir de vegera wî ya welat hat bîre. Wê çaxê naskir ku diya wî çûye heqîya xwe.

Evarî ji hevalê xwe re got:

— Tu zamîli ku diya mi veşartine?

Hevalê wî bi "erê" bersiv da.

Li ser mezel, ew û hevalê xwe demek dirêj di nav tirban de gerryan, lê hevalê wî bi ser gora diya Windoya venebû. Ü dema jê pîrsî:

— Ma te nedît li ku veşartin?

— Belê min dit, lê gelek tirb niha li dorê çebûne û dilê min li wan herçar tirban dişeteete.

Wê çaxê ji Windayo nikari bû bi dilê xwe li ser tirba diya xwe bigri. Her û her giryê wî di gerdanê de ma. Windayo gelekî xwest bi diya xwe re bipeyive: Yadê! Va ez hatim, ma çima tu li bendî min nemayı? Yadê quisûra min efû bike û têxe bin niğen xwey! Lê her û her Windayo ma çav zuha û dilhiş û polî poşman vegeriya malê.

Heger tu li sikakêñ bajêrê me bigerî, bêguman, wê Windayo birgi te bibe. Hin serî li ber û çav li erd ê. Tu dibê qey li tiştekî digere. Heger hat û te silav lêkir, wê silava te vegérine û ji te bipirse:

— Raste ku teht ji ciyê xwe bileqe tucarı nikare şûna berê bigre? Ü gelo raste genim di nav ceh de ne kêmî zîwanê di nav genim de bi ziyane?

Windayo bendî bersîva te namîne. Çimkî oliviskiline, çivekê, wê bide xwe û du re bi dilşewitî borîni pê dikeve.

Ma gelo dînigrin?

ber xwe. Ji ber ku wetaq tarî bû, wecê Silo ne dihatin dîtin, dibe ku xwêdaneke sar û germ jî dabû. Dengekî wek zengil kenînê da rawestandin:

-Apê, çima mîrê berê çawa bû -ne?

Çend kesên dîn jî herkes ji çiyekî ve:

-Apê Remo, tu bi serê kurê xwe yê sérîn dikî, dê tu îsev ji me re qala mîrê berê bikî. Bu çend carin, ku tu di nav gotinê xwe de qala mîrê berê û gîrbûniya wan dikî. De heydê, hema îsev ji me re di dewsa çirok û xebroşkan de qala mîrê berê bike.

Kalek li pêş qirika xwe çekir û:

-Malviritiye Remo, piritû te vê zivistanê çirokan got û viran kir, te mala me xirab kir, du metre berf li me barî.

Bi dûwa cixaran re kenînê jî wetaqê tijekir.

Apê Remo gotinê wiha qet li xwe ne digirtin. Kêfa wî pê dahat û hîn jî pişê wî mezin dibû. Li ser daxwaza civatê ew dîsa li kutîya titûna Bedlisê gerîya û dest bi pêçandina cixareke dîn kir. Cixarê bi tiliyên xwe li hev pêça. Qeraxêñ wê şil kir. Bi diranêñ xwe qeraxêñ kaxiz kurişand. Û li ser hev çend cara tûk kir. Bi lefandin û zelqandina cixarê re dest bi çiroka mîrê berê kir:

-Silo li ku, mîrê berê li ku!.. Silo, pepûgê min... tew tew mala mîran... Li gor gotinan, bi xwe rebenê Silo bikira nav dest û lepê xwe dê ava wî derxistan.... Mîrê berê her yek bejna wî wek dara çinarê bûye. Û her wisa we risek jî li nav wan ne dahatin girêdan i. Serî wisa mezin hoyyy xwedêwo, wek sítîla mala keyayê gund ku çend kîl danû diçe pê... Poz serik wek qelûna mîr. Çavê reş û mezin, çavê gayê mala xalê Hecî, li ba çavêñ mîrên berê jehr belav kiriye. Bi Isa û Mehemed dikîm li gor, ku dibêjin her gohek ji pelasa mala mele mezintir û pirtir... Kepira stû haa... xurt û qalind wek xinzîrê cîyê Miya kûwanê. Dest û lep ji melhêva xalê Mehoş girtir. Ezingê daristana mala Hecî Usman li her zend û çeplêñ wan get tiştekî nîne. Her çîp li wan

ku 10 mîtro ji wan re şalwarek bi zor derdiket an na... Serê gayê heft(7) salî bi zor û bela ji wan re dibûn çaroxek. Her cara ku li ser xwarinê rûdiniştin, malxiraban bi teştek nan, sitilek mehir zît davêtin..

Lê, li gor xwe jî bi quwet bûne haaa! Di roja girande, di roja

qewmandinê de karîbûne kerekî bi tevlî barê wî ve hilbigrêñ. Qasî tonek

êzing di carekî de dikirin piştiyekî... Bi tas û tar di rojeke de zevîye çinîne... Rîya heft qonaxî kirine yek...

Lawê Keya Zilfo, xwe ranagirt, fîkinîyeke tûj û dirêj kişand û:

-Waxxx!...li min û hefsed bavê min. Ma tu nabejî cinawerê berê bûne!...

Du kes bi hev re êrişê Zilfo kirin. Yek ji wan:

-Kuro Zilfo dilopan neke... bisekine...

Ji der terpe repek hati û pêre deng xwadîyê rabû ber bi derî mesîya.

Bi vekirina deri re çend kes bi bev re ketin hundir û silavdan. kesen ku li wetaqê bûn, hemû rabûn ser xwe. Ser û cilên kesen nûhatî ji berfê çik spî bibûn. Berfa xwe diweşandin û cilên xwe derxistin. Dîyarbûn, ku ji gundekî dûr têñ. Yekî ji wan tifinga xwe avêt mixê dîwar û çavêñ wî bi Remo ket:

He, heyyyy Remoyê malxirab tu ðibîni berfê da gulêñ daran!

Remo keniya û berbi wî çû û bersiva wî da:

Ma serî li we geriya, hun di vê berf û bapûgê de ji mal û gundêñ xwe heta vira têñ!

Kesen nûhatî:

-Ma em kari bûn xwe ragirî; êvar e û berf jî dibare; niha te dest bi çirokêñ xwe yêñ dawî nehatî kiriye.

Civatê cî fireh kir. Agir ges kirin. Xwediyeñ malê çaydaneke mezin tije av kir û xist nav kuçikê. Hîn civat xwes û ges dibû. Vire-vir û şingêna qutiyen cixaran bûn. Sirpêñ û şeqêna hestan bûn...



# BÜKA AGIR

EHMED CIWANRO

— Ji Ismail Beşikçi re diyarı —

Berbanga te va ji nû ve  
 Tê çirandin  
 Kulûkên bi xûnava zérîn himbêzkirî  
 Qirêj kîrin  
 Peritandin ji xewnêñ nazik !!..  
 / Erê hekarî /  
 Mêvanêñ te ne îşev  
 Potnêñ Romê res  
 Çavşoriya hêzên nexwêş  
 Subehêñ te koça xwe barkirin  
 Evarêñ te tariya komerîn naskirin  
 Helbestêñ baranê gelî spas nekirin  
 Dîroka te nû ye...  
 Şînîya te zû ye...  
 Tu ar û tu dû ye...  
 Tu bûk û berbû ye / hekar /  
  
 Şevêñ payîzê digindirin  
 Zarokên bi şîr vekirî digindirin  
 Tfîyêñ jê kîri xwîna xwe dimijîn  
 Xwe davêjin  
 Bi ser berbanga belavkirî  
 Salek e noker  
 Çû!!...  
 Hat!!...  
 / Bi ser hekarî de zivirî /  
 Xewn ji hev ditîrsin  
 Dişkin  
 Weke hêşran li ser hinarkê rokê  
 Zarok navêñ xwe dadiqurtînin  
 Ne AZADIN / NA.. /  
 Ne dilşadin / NA.. /  
 Ne bengînîn / NA.. /  
 Lepêñ gundiyan bi lez  
 Movikêñ xwe hiltînin  
 Tarî digazine ji TARİYA xwe  
 Tifdike RENGÊ xwe  
 Derî têñ girtin  
 Bahozêñ zer poşmandibin  
 Zemîn tê xemilandin  
 Çîrisandin  
 Bi maçen ziwa  
 Bi singen singokirî  
 Bi pêseren tazikirî  
 Bi hekarî nîv saxî mirî!!...  
  
 HEKARÎ — De rabe ser xwe

Mêja buharê li me çû  
 Dayîkêñ xwas li ser bênderan  
 Berzûrî siya xwedê dibin  
 Sorgul xwe cûda dikin ji  
 Daxwazîya baranê  
  
 Xwedayê / dilovan /  
 Sêwîye çerm terîkî  
 Ketiya şikefta vedyê  
 / HEKARÎ /  
 Pêlek ji girêza xwe bidyê  
 Lê xwe / medyê / lê...Lê!!!...  
  
 Ziftane / HEKARÎ /  
 De were... em bi xwinê destmêj bigrin  
 Lê.. rohilat keşye roava  
 Lê.. bakûr ketlye başûr  
 Lê.. nema zanim kîjan alî  
 Bikim kefen ji boyî dilê xwe  
 Ji bo pirtûka birçîbûnê  
 Ji bo tîrê ja serbixwebûnê  
 Lê.. nema zanim / hekarî /  
 Kîjan stranê veşerim dibin  
 Çermê xwe de  
 Ji boyî serxweşiyê  
 Lê.. nema zanim kîjan gotinê  
 Ji xwe re bikim balgeh  
 Ji bo yi rûreşiyê  
 Sînorêñ me tev derbasî hev bûne  
 Welatê me bûye naveroka lehîyan  
 İRO TU:  
 Navelî bijartiyê  
 Cengek hejmartiye  
 Dengek veşartiye  
 Di ruwêñ te de girtine  
 Rûpelêñ spî  
 Li ber çavêñ te yêñ hingîvin  
 Tarî kirine rûnahîyê  
 Destpêka evînê  
 Dawiya qirinê  
 Hemû sînorêñ mizgînê!!...  
 Hekarî — İRO — SUB  
 Wê serhişkiya te dorpêç bike  
 Gulê baranê  
 Kaniyêñ xwînê, wê ferhenga jînê  
 Avis bikin  
 Wê hekarî — berzan bibe — bizê

"H" Tipêñ tûj dihingevin rojhîlat...  
 "E" Demeke nûjen şîldike lêvîn terîkî...  
 "K" Destana mîrxastyê dilebite  
 Li ser parsiwêñ hêvidariyê...  
 "A" Azadîyek sor bi poşiyêñ xwe  
 Perda bindestiyê diçrîne  
 Bi qulocen xwe navê zîndanan  
 Li ser enîya rokê dikole...  
 "R" Kevok li hev dicivin  
 Xwe dişon bi hêstrê ezman  
 Xwe dipekinin  
 Diglîmin hêlinen gulan ..  
 "I" Gulyêñ hevrêsim  
 Dipêçin bîranîn bi tevzinok  
 Bi seva yekem re dibin zarok  
 Büka agir ser bi xêli dikin  
 Dikin hewar  
 Her bijî  
 Her bijî  
 Jîna bê neyar...  
  
 HEKARA MIN...  
 HELANA MIN...  
 Wê bajar bimrin  
 Wê stran bimrin  
 Wê saza perîşana bimre  
 Wê bêñ kuştin  
 Serjê kîrin  
 Hêviyêñ me  
 Devîyêñ me  
 Berberojen ku ust xwarkirine  
 Bi dû rokê de  
 Wê bêñ serjê kîrin  
 Lê :  
 Wê şîlî têkeve şûna zuhayê...  
 Wê buhar az bibe ji tayê...  
 Wê genim cûda bibe ji kayê...  
 Subehêñ bênav  
 Xûnav  
 Gul û silav  
 Konê xwe wê vegrin  
 Li ser memkê çiyan  
 Wê evîna veşarti  
 Maç û dîrok  
 Bi hev şabin  
 Mizgînêñ teze wê  
 Xuyabin  
 Wê xuyabin!!...

# pêşniyariya redaksiyonê

Redaksiyona me, di roja 26. 03. 1986 — an de civîya û rewşa 9 mehîn borî di çav de derbas kir. Xebata dema borî pîva û hêjand. Redaksiyonê rexne li xwe girt û kil û kîmasiyên xwe dîyar kir û pejîrand. Em hemû endamên redaksiyonê, ji bo Berbangeke hûn baştir û tê kûztir, li ser van xalê n jîrsin gehîştin armanc û dîtineke teví:

\* Ji bo redaksiyon û bi taybetî ji bo Berbange gelşa (probîma) herî giring, bingehîn û ya mezîn peydakîrin û pêk-anîna kar û haletên teknîki ye. Divê û pêwîst e, ji derê redaksiyonê komîteki teknîki hebe. Û bi kîmasî divê di komîta teknîki de keseñî kîrhatî û jêhatî, bi profesyoneli kar bike. Lokal û ciyê redaksiyonê hebe. Ji bo weşanê makînê û haletên nûjen hebin.

\* Dîsa ji bil redaksiyonê û komîta teknîki divê komîteke weşan û belavkirin hebe, ku Berbange di wexta xwe de biser û ber belav bibe. Aktueliya xwe wenda neke. Bigînî je her xwendevanê kurd.

## TOLERANS

li munaqşen siyasi û ideolojik bigrin. Di destê wan de sedemên giring ji tunin. Bersiv "seren kesan tevlî hev di be!" Di bingehê xwe de, propaganda dewletên koloniyalist û partiyen wan yên cûrbe-cûr serê bizûtnewa çep û kesen welatparêz tev li hev dike. Divê mirov van herdu tev li hevi û cûrên munaqşen ji hev cûda bike. Munaqşen û dîtinên cûrbe-cûr, di civatekî weki Kurdistanê de gelekk normal e. Divê em welatparêzen kurd, hinek metod û pivanen munaqşen û danûstandinên ramani û ideoloji baş vekin û zelal bikin. Fêda gelê Kurdistanê tê de heye.

## KOLONİYALİZM Û TOLERANS

Dewlet û hêzên koloniyalist, di bingehê û koka xwe de li dij demokrasî û azadiyê ne. Iro li Kurdistanê ji rewş weha ye. Dema munaqşa demokrasiyê û azadiyê bibe, bingehê koloniyalizmê diheje. Ji ber vê yekê ji hêzên koloniyalist hebûna neteweyê kurd inkar dike. Miroveki xwedî mantiq û rewşenbir nikare hebûna netewê kurd inkar bike. Zimanê kurdî qedexe bike, mirovan ji bo dîlin, û xebata wan a siyasi bigre û bavêje zindanan. Dewletên koloniyalist, ji ideolojîya welatparêzî ditîrsin û nikarin neteweyê kurd di vi warî de qanî bikin. Welatparezekî kurd di çavên dewletên koloniyalist de mijadperest, parvez û xulamî imperializmê ne. Gotineke kurdî heye : "Heko meko navê xwe li hevalê xwe ko!"

Ev ji mesela dewletên koloniyalist in. Dewletên koloniyalist navê xwe li welatparêzen kurdan dikin. Ji xwe kes ji dewletên koloniyalist tolerans naxwaze. Armanca min di bin zilm û zordariya dewletên koloniyalist de hêzên welatparêz li hember hev, ji hev re çawa tolerans şanbidin û di çarçova netewî û demokratik de li dij hêzên koloniyalist û paşverû çawa hêzên xwe bikin yek e. Di civaka Kurdistanê de tû tiştekî rewşenbirî blî rêk û pêk ne hatiye munaqşe kîrîn û vekirin. Li gor dîtina min civata me niha di despêka munaqşen siyasi, zanyari, kulturi û edebî de ye. Li welatên pêşketî ev proses, bi sed salan ve berdewam e. Li wan welatan, li welatên serbixwe û aza bi hezaran pirtük, lêkolîn, lêgerîn, kovar, rojname, broşür hene. Nivîskar, rojnamevan, dirokzan, zimanزان, teknîker, ekonomist, hozan û muzisiyen û govenger hene. Ma gelo ji van çend kes kurd hene. An ji yêñ ku hene xwe kurd

\* Redaksiyon ji 5 kesen kîrhatî û jêhatî pêk bêt.

\* Berbang di salê de 3 hejmar xweser bi swêdi' derkeve û bêt belavkirin. Di wan hejmaran de divê rewşa kurdan li welat û li welatên Ewrupa ji her ali ve baş bêt vekirin û zelalkirin.

\* Divê redaksiyonâ ku nû bêt hilbijartin, bi nivîskar, helbestvan, wênekêş û hûnermendêñ kurd re tê kîliyêñ germ deyne û pêşve bibe.

\* Ji bo hîn baştir vekirin, zelalkirin û awakî bingehîn pişâftina gelş û pingarêñ ku li pêş Berbange ne, divê di rojeva kongre de, ji bo munaqşen xaleke arzi hebe, ku nûner di kongre de, ji bo Berbange re û metodêñ pişatînê yêñ bingehîn bibinîn.

Redaksiyona me, ji hemû xebatkar nivîskar, helbestvan, wênekêş, nûçegîhan, kiryarvan û xwendevanêñ xwe re spasdar e! Ji hemûyan re serketin û serfirazî dixwaze!

## REDAKSİYONA BERBANGÊ

zanin û di vi warî de xebat dikin. Ji bo ku em karibin, mirôvên welatparêz di warê zanîstî, kulturi, siyasi û civakî de bigîhînin, ji wan re rê û hinek imkanan çêkin; divê em toleransan bidinne wan Gelek cara li şûna aîkariyê, em nigêñ wan dişimtinin. Gelo fîyda kî di vir de heye? Zerara gel û welatê me tê de hene.

Dewletên koloniyalist, di her warî û her ali û her babeti de derûdor li me girtiye. Riyân sinc stirî kiriye. Van dewletên xwînxwar û xwînmêj dixwazin bizûtenewey kurdayetiyê bidin rawestandin. Ji bo firotin û bazirganiyê ji tû cari mirov nikare, pirtük, kovar, rojname û kasetên kurdî li welat belav bike. Li Kurdistanê hebûn û jîyana kurdan bi xwe siyaset e. Oedexe ye. Dîrok, ilm û zimanê kurdî bûye siyaset. Di bin hewqas mercen hov û dijwar de, divê em kes û hêzên welatparêz, ji hev re bi tolerans bin. Ji hev re aîkar bin. Bi warê siyasi re, di warê zanyari, kulturi, edebî û ziman de ji dest bidin hev. Civata kurdan muhtaci tolerans, demokrasi, danûstandinêñ birûbaweriye ye. Civata me hêdî-hêdî, giran-giran ji xewê radibe. Di vê heşyarbûna netewî de divê aîkariya hev bikin. Tahamûlên dîtinên cûrbe-cûr bikin. Bihna xwe gelek fireh bikin û kesen welatparêz bi tiştên biçûk û erzan mahkûm nekin. Xebata ronahîkirina fîkrî û siyasi divê di civata me de şax bide, ber bide, mezîn bibe û bibe mal û hebûna gelê Kurdistanê. Kurdistan bila di vi warî de ronahî bide, deng bide, ji bo xebata gelêñ rizgarîxwaz. Divê bi zanyari em pêşve herin û bîkevin nav koma gelan û cihêñ xwe bigrin. Hozanê kurd Seydayê Cigerxwin weha dibêje:

Welatê kurdan hemû çîmene

Eğit û şer û piling lê hene

Hemû bira û pîşmanen me ne

Ey felek felek, ey zalim felek

Kanî Kurdistan, ka birca belek.

## ÇAVKANÎ

\* Traktat Om Folket, Voltaire- Stockholm- 1964

\* Kovara Radix, hejmar n:3-4 1979

\* Upplysningsens Dialetik, M. Horkheimer T. W. Adorno Roda Bokforlaget 1981

\* Filozofii och Revolution- Carl Goran Heidegren Symposium Stockholm 1984

TÊMÛRÊ XELÎL MURADOV  
27. 02. 1986 YEREVAN

# XEBATA KURDZAN

## LAMARA BARIYE ULMÎ

Akadêmia Komara Gurcistana Soviête Zanyarî ( ulma ) sê meha carekê kovarekê derdixe bi sernivîsara " ji cêrga dîrok, erdvejandin ) arxéologîa), miletzanî û îskûstva terîqe " Van dawiya li bajarê Tbilisiê hejmara wêye bi sirê derket.

Wêda gelek miqalêd heweskar hene derheqa rewş û demê welat û gelêd Rohilata Nêzikda, çawa ji bo nimûnê, " Aborya Rohilata Nêzik sedsalêd 12-a û 13-da, Rewşa sosial-aboriê li Iranê, Li sedsalâ 19-a, Problêma hildana paşdamayıtiya rohilata Turkiyeye sosial-aboriê nava biryarêd partiaêd welatê bûjûazîye siasetîeda" û yên mayîn.

Miqala kurdzan, doktora dîrokê Lâwara Barî p'asaêvaê, ku vê hejmara û bi zimanê rûsi ronahi dîtye, wa tê navkirinê: " Rewş û pirsdaninêd kurdzanîe Gurcistanêda." Em wêya bi kurtkiri na-va raberî xwendevanê kovarê dîkin.

— Jimara kurda li cihanê dighije 20 miliônî. Kurd li Turkiyê, Iranê, Iraqê, Suriyê, Afganistanê û Yekiti Soviêtta dimînin. Gelek kurd, xwezma kurdên Turkiyê, mihacirî Avropa Roavaê bûne

û li şaristana dijin. Tenê li komara Almania Fédêral weke 200 hezar kurd dimînin. Kurd herweha li Swêd, Bêlçika û Fransiyê ji hene.

Kurd, ku hesab dîbin bineciên Mesopotamia Bakûre kevnare, ji sedsalâ 7-a destpê kirine hatine berbi Asia Biçük û Pişkavkazê. Çend qebîlen kurda sedsalâ 16-a bi jimareke biçük hatine Gurcistanê. Lê kurd hîmlî pey şerê hemcihaneyî pêşin ji Turkiyeye hatine Gurcistanê. Sala 1918-a ji wanê, Surmelîê û Qersê ev ber, qebîl û eşîret hatine Tbilisiê: Korkitî, Mendikî, Mendesorî, Beravî, Coxreşî, Mamreşî, Anqosî, Masekî, Kaşaxî, Kîlerî, Pivazî, Bendûrî, Sîpîkî, Hesîmî...

Vê demê Tbilisiêda 26 hezar kurd dijin. Ewana li Tbilisiê jiyanekê bextewar derbaz dîkin. Pirê wan kurdên ezdîne. Nava wanda rîncberên pêş, gelek xwendekar, roşinbirên kurda hene.

Li Gurcistanê guhdarîke mezin tê danînê ser lînihîrandin û azirûkirina pîrsen dîrok, miletzanî, çanda kurd. Wê derecêda xebateke berbiçev kirine

kurdzan A. Mîntêşavîli, Kerem Emîev, û yên mayîn.

Sorişa Oktobire sosialistîye mezin roleke giring lîst nava jiyanâ kurdên Gurcistanêye sosial-aboriê û çandesiasetêda. Ew yek gumreh ( qewîn ) bû xwezma van salêndawida. Bo nimûnê, em bêjin, ku Komîte Navbendi ya Partîa Gurcistanêye Komünîstîye sê bîryarêñ derheqa mecalen qewîn kirina xebata idîatiê-terbiyetkirinê nava binecién Gurcistanêye kurdada qebûl kirine.

Gurcistanêda lîteratûra kurdî ronahî dibîne, rádioa kurdî heye, teâtra kurdîye gelêriê alî xweykirina erfêdet, ziman zargotina gelê kurd dike. Kurden Gurcistanê, ku usa ji li Têlavê, Batimê, Rûstaviê dimînin; erf-edet, eyd-erefatêñ xweye mîletiêye baş xwedî kirine.

Bi serî xebata dota kurda, kurdzana dilsoz û zîrek-Lamara Barî, ku ser bin-geha melûmetî û berevokêñ ulmî hatye nîvisarê, gelek xwendevanê kovarê nasya xwe didine çend derecêd emrê kurdên Gurcistanê, usa ji şerkarya kurdaye mîletiê-azadariê li hemû perçêd Kurdistanêda.

• •

### SİSTEMA FEDERASYONEN BİYANI DI 1987 AN DE

## TÊ GUHARTIN

Parlementoya Swêdê, dixwaze li ser daxwaz û pêşniyariya sazgeha bîyanîyan ( Invandrâraverk ) di sala 1987-an de sistema federasyonen bîyanî, ji binî ve biguhurîne. Di vî warî de, kar û xebat gelek pêşve çûye. Di parlementoya Swêd de, di komîyonen amade yên pêşniyarname û guhartina qanûnan de, ev pêşniyari zelal û temam bûne. Dê di demeke kin de parlementoya Swêdê wan pêşniyarnaman di çav de desbas bike û di derbareyên wan de bîryar bide.

Li gor agahdarî û rînasiya berpirsiyare Sazgeha Bîyanîyan, ji wan guhartinê giring û bingehîn çend jê ev in:

\* Pêwîst e, ku bi kîmasî 1000 endamên federasyonan hebe. Ew federasyon

yonên ku ji 1000 î kîmtir endamên wan hebin, dê federasyon neyên qebûl-kirin û tû alîkarî ji wan re nebe.

\* Pêwîst e, federasyonen bîyanî demokratîk bin û li gor qanûnen swêdi kar û xebat bikin.

\* Komelîn endamên federasyonan di-vê li tevayiya Swêdê belav bin, ne bes li çend bajar û dorhêlan hebin.

\* Divê qada xebata federasyonan û weşanîn wan Swêd be.

\* Bi destpêkirina sistema nû re, ew alîkariyên aboriî yên ku ji bo projên xortan zarokan, jinan, lêkolîn û lêgerinan, kovar û hwd. bi temarnî di carekî de têb birin. Li gor hejmara endamên federasyonan, dê alîkariyên aboriî bêt kirin. Ew mercen alîkariya abo-

rîdê weha bin:

Ew federasyonen ku di navbera 1000-3000 î de endamên wan hebin, dê ji bo alîkariya saleke 250.000 kron alîkari bigrin Mesrefa weşan û kirê ji di nav de ye. Ji derê vî pereyî tû alîkari dê neye kirin. Ew federasyonen ku endamên wan di navbeyna 3000 - 3500 î de be 400.000 kron, 4000-4500 650.000 kron, 7000-8000 endamî 800.000 kron, 11000 endam 900.000 kron û yên ku 15000 endamên wan hebin 1.000000 ekî bigrin.

Xweza, ev bîryara ha, ji bo federasyonen biçük wek ya me, guhartineke gelek pozitîv û pêşketî ye. Lê bes divê em li gor rewş û mercen nû, kar û xebat şan bidin.

ÇIROK

## NEWROZ

CIVANÊ GULAN

LENİNGRAD - 1985

Zivistan diçe û naxwaze li pişt xwe binêre, mirov nizane gelo ji bo çi usa ew ditirse; tırsa wê ji ci ye?

Dema ku bihar tê, gul, kufîl, nêrgiz û rihan rûyên xwe yên ges vedikin. Ji wê tariya dîrêj re dibêjin bes e, bes e û li ber zikê sibê de, li ser rûkêñ pelan, ji kôf û evin hêstiran dîkin û bi wan hêstirêñ xwe, av didin jîyana xwe û bi wê şebnemê xwe dixin rengê dilan, ci sor, ci kesk û zer, xwe dixemlinin, ji bê destpêka biharê yan ji NEWROZE.

Bavê Şêro, wek her salî di destpêka biharê de rûniştin jê re qet tune, bi dizî ji xanîki dikete xanîki û kar û barê xwe, yê NEWROZE dîkir.

MIT ( polisê istîxberatê) ne yek, ne dudu û ne sisê nikaribûn careke ji Bavê Şêro bibinin û ew çawa kar û barê Newrozê pêktîne. Bavê Şêro, yek ji mîrê mîrxas bû. Ev bû 49 salen wî, ku vi karî dike. Ma hêj em ci ji wi dixwazin? Her sal di roja Newrozê de, her tiş ji aliyê wi de amadeye, bi ci ye. Ew, li ser çar qunaxêñ bajêr, li ser çiya û giran agirê Newrozê pêdixe! Xort, keç, zarok jin û mîran li hev dicivandin û bi dizî Newrozê piroz dikirin. "Guhêñ erdê heye", çawa guhêñ MÎTA dewletê tune ye? Dema heha - Newrozê nêzik dibû, MÎTE bêtir li Bavê Şêro dinitirandin, ji ber ku ka disa xebata Newrozê dike an na.

Hîn ji Newrozê re gelek mabû, Bavê Şêro, bi hevalen xwe ve dest bi karûbare Newrozê kiribûn. Bavê Şêro, şeveke dît, ku kesekî li dûv wî, her tim dîmeşe û awirê jê nabire. Lê Bavê Şêro, di ber xwe de got: "De bera MIT be, min bi xwe karê xwe ji bo Newrozê kir. Ci dibe bila bila bîbel..."

Ew, derengiyê şevê bi serê xwe dizivîrî mala xwe. Serê xwe yê westandî da ser balgiyê û demeke dîrêj nekete xewê, tin ew mirovê ku li dûv wî dahatin, diket ber çavêñ wî û bala wî. Bavê Şêro, dikir ne dikir, xew nediketin çavan. Li jina xwe sérkir û keserek kişand. Çavêñ wê werimî bûn. Ji ber ku derend razaye. Ew, her û her li heviya bavê zarwan bû. Bavê Şêro destê xwe da ser serê jina xwe û ji xwe re bi porê wê dilist. Gulê ji xew rabû û jê re got:

"Silo ma tu ne birçî yî?"

Silo jê re got:

"Sibê cejna Newrozê ye. Birçibûn û xew işev nîne. Rabe, hinek av ji min re germ ke, ez ê serê xwe bisom."

Li der, li ber deriyê Bavê Şêro, peyayê MÎTE rûniştibû. Li heviya Silo bû; dema ku ew derkeve û here agir li serê çiya pêxe....

Silo gote Gulê:

"Jinê kincen paqîji min re bîne. Wext dereng e."

Silo, bi lez parîk nan dixe û kincen xwe li xwe dike û ji leza ji bîrkir ku maçeke ji Gulê bistîne. Bi lez Silo serê xwe tenê ji ber derî derxist û bi lezî maçek ji Gulê stand.

Deriyê hewşê vekir, dît ku ew mirov, bi xwe li ber de-

rî rawestaye. Ü çawa Silo dît:

"Silêman Efendî, tu bi ku de diçî vê sibê?"

Bi vê pirsê, wek yek aveke sar û dûv re germ li ser Silo dake. U Silo:

"Ez diçim ser karê xwe. Ka tu li vê derê ci dîki?"

Peyayê MÎTE, di cî de dest davêje demanca xwe û ji Silo re:

"Paşve vegere hundir!"

Bavê Şêro û peyayê MÎTE diçin oda mîvanan. Ü deng li jina xwe dike:

"Gulê metirse, haya te li zarokan hebe, ew ji xew ranebin. Ü ji me re qehweke şerîn li ar de."

Peyayê MÎTE, ji Silo re dozê eşkera kir û got:

"Silêman, serokê me ferman da, ku tu iro ji mala xwe derneyî û ez naxwazim, tu ji min bipîrsî 'çîma û ji bo ci'"

Bavê Şêro her tiş fêm kir, "yanî naxwazin ku ez karê Newrozê bikim...."

Wî qehwa xwe li hev dixist û serê xwe dikir ber xwe Bal û ramanen wi tev li ser agirê newrozê bû. Dê ki iro agir li serê çiya ges bike... Wî destê xwe davât qutuya xwe û ji tutinê cixareke pêça. qutuya xwe avêt ber peyayê MÎTE:

"Ha ji xwe re yekê bipêce ezenbeni..."

Bavê Şêro, ji berîka xwe şixatê derxist û cixara xwe pêxist. Silo, li serê cixarê nêrî, agirê Newrozê hat bûra wî, dîsa dilê wî bi hêl lêxist. Rahîste şixatê û ji xwe re darikên şixatê yek bi yek pêxist û ji xwe re li agir dinêri. Vi vê yekê dilê wî fireh dibû. Ü agirê Newrozê hin bi hin ges dibû. Darikên agir carnan digiliya destê wî û goşte destê wî dişewitand. Lê Silo bi wî agirî qet ne dihesiya! Têhna Silo ne dişket bi wî agirî. Silo li ber pencerê rûnişt bû û dema ku dît çawa roj hilat û dinya ronî û ges bû; bîhna Cejna Newrozê li pozê wî xist; rahîste şixatê û agir bi perdîn pencerê xist. Agir lezî û zîzîgî ta giha beştê zikê xêmî. Peyayê MÎTE, jê re got:

"Mal ne xirab, tu ci dîki?"

Lê agir diçiqjîjî û dikir terç terç.... Peyayê MÎTE, ji tırsa xwest bazde der. Lê Bavê Şêro, ji nişka ve xwe avêt ser û bi her du destê wî girt. Ev car peyayê MÎTE ne kari bû bazde û ne kari bû debanca xwe bikşine. Bavê Şêro, bi hez wi girt û guhaşt ser hev û pê re diçqriya:

"Kuda direvî tirsonek, te ne hişt ez iro agirê Newrozê, li ser çiya pêxim û ges bikim. Lê ez ê te bi xwe re di agirê Newrozê de bisewtinim."

Peyayê MÎTE, hawar û qırîn dikir û bavê Şêro ji, bi dengeki bilind distiryan:

"Ey Newroz ey Newroz tu yi cejna azadî!..

Bê xêr hatî û gelek piroz, kurd te bi rihe xwe nadî!

Te pir serê me hilda, me bindestî nema di!"

Agir her ku diçû, bi don dibû û sor dibû û bilind dibû!

ADRESS/NAVNIŞAN:  
RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

Hamid Arabi  
Do Vostrebovania  
310113-Khartov-113  
USSR

